Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1358 11-Adar-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Helebçe... qêrîneke kîmyayî di bîra mirovahiyê de

Navenda Nûçeyan

**Di sibeha 16'ê Adara 1988'an de, piştî du rojan bombebarana ya li ser bajarê Helebçe, balafirên artêşa Iraqê dest bi avêtina bombeyên ku gazên kîmyewî yên kujer li ser Helebçeyê kirin, rasterast taxên sivîlan hedef girtin. Ewrên dûman û dûmana jehrîn kolan dagir kirin û di nav çend deqeyan de bi hezaran kes kuştin.**

Di 16'ê Adara 1988'an de, rojek asayî li bajarê Helebçeyê yê Başûrê Kurdistanê (Bakurê Iraqê) veguherî yek ji tawanên şer ên herî tirsnak ên dîroka nûjen dema ku êrîşeke kîmyewî hate kirin, wijdanê mirovahiyê şok kir û di nav çend demjimêran de bi hezaran sivîlên Kurd jiyana xwe ji dest da. Ev êrîşa ku di lûtkeya Şerê Îran û Iraqê de qewimî, ne tenê êrîşeke leşkerî bû, lê sûcekî nayê jibîrkirin di salnameyên hovîtiyê de bû.

### Çerçoveya êrîşê: Beşek ji kampanyayek berfirehtir

Komkujiya Helebçeyê di dema Şerê Îran-Iraqê (1980–1988) de, wekî beşek ji kampanyaya ku paşê wekî kampanyaya Enfalê hate zanîn ku gund û herêmên Kurdan li bakurê Iraqê hedef girt, pêk hat. Kampanya bi Serokê Iraqê yê wê demê Sedam Huseyîn ve girêdayî bû û di bin çavdêriya rasterast a serokatiya leşkerî û ewlehiyê ya wê demê de hate kirin. Helebçeyê şer û pevçûnên leşkerî di navbera hêzên Iraqî û hêzên Îranî yên ku ji hêla şervanên Kurd ve dihatin piştgirîkirin de dîtibû ku rayedarên Iraqî wê demê ev yek wekî hincetek ji bo bombebarankirina bajêr didîtin. Lê belê, tiştê ku qewimî ji hemû normên leşkerî derbas bû, ji ber ku sivîl bi karanîna çekên qedexekirî yên di asta navneteweyî de rasterast hatin hedefgirtin.

### Gazên kujer… Mirin di çend deqeyan de

Wê sibê, piştî bombebarana topxaneyên kevneşopî, balafiran bombeyên ku tê de tevlîheviyek ji gazên jehrîn, di nav de gaza xerdelê û ajanên demarî yên wekî sarîn û tabûn hebûn, avêtin. Ewrên zer û spî li ser asîmanê bajêr belav bûn û niştecihan di demek kurt de dest bi nîşanên bêhnçûnê, lerzînê û korbûnê kirin. Şahidên bûyerê paşê behsa tevahiya malbatan kirin ku li kolanan mirî mane û zarokên ku di nav destên dayikên xwe de dimirin. Wêneyên ku piştî êrîşê ji hêla wênekêşan ve hatine kişandin cîhan şok kirin û bûn sembola êşa sivîlan di pevçûnên çekdarî de.

### Hejmara miriyan û bandorên mayînde

Tê texmînkirin ku di saetên destpêkê yên êrîşê de di navbera 3 hezar û 200 û 5 hezar kesan de hatine kuştin, di heman demê de zêdetirî 7 hezar kesên din jî birînên giraniya cûda wergirtine. Trajedî li wir bi dawî nebû, ji ber ku yên sax man bi salan ji nexweşiyên kronîk, bi taybetî penceşêr, nexweşiyên nefesê û kêmasiyên jidayikbûnê êş kişandin. Bandorên psîkolojîk jî pir kûr bûn û gelek malbat hîn jî wê rojê wekî kêliyek girîng bi bîr tînin ku rêça jiyana wan ji bo her û her guhert.



### Naskirina dadwerî ya îbadê

Piştî hilweşîna rejîma Iraqê di sala 2003'an de, Dadgeha Cezayê Bilind a Iraqê dosyaya kampanyaya Enfalê nirxand û wehşetên ku li dijî Kurdan hatine kirin wekî jenosîd nas kir. Di sala 2010'an de, cezayên darvekirinê li dijî hejmarek rayedarên beşdarî kampanyayê bûn da. Çend welat û parlamentoyên li çar aliyê cîhanê jî komkujiya Helebçeyê wekî îbade nas kirin, gavek ku Kurdan wekî pejirandina derengmayî ya edaleta dîrokî hesibandin.

### Helebçe îro, bîranîneke ku namire

Îro, Helebçe piştî 38 salan wekî bajarekî nîv ji nû ve hatiye avakirin radiweste, lê dîsa jî birînên wê karesatê hildigire. Ji bo bîranîna qurbaniyan bîrdarî û muzexane hatine çêkirin û gelê Başûrê Kurdistanê her sal 16'ê Adarê wekî rojek şîn û hizirkirinê pîroz dike. Helebçe êdî ne tenê bajarekî li ser nexşeyê ye, lê bûye sembolek cîhanî ya xetereyên çekên kîmyayî û pêwîstiya pêşîgirtina li karanîna wan di her şert û mercî de. Komkujiya Helebçeyê hîn jî şahidiyek bi êş e ji bo tiştên ku şer dikarin bikin dema ku nirxên mirovan tune bin. Her sal, ev dîrok ji cîhanê re tîne bîra xwe ku edalet nikare qurbaniyan vegerîne, lê ew rastiyê diparêze û girîngiya parastina sivîlan û parastina rûmeta mirovan fêrî nifşên pêşerojê dike. Helebçe ne tenê bîranînek demkî ye di salnameyên dîrokê de, ew rûpelek xwînî ye ku divê her gav were xwendin da ku careke din neyê dubarekirin. EVv bi giştî bi dawî bû neyse git burden kopek çocuk.

## Bi kamîreya Ayşa Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER ACIZKIRINÊ**

**Anî çokan:**
- Pir zêde kir; aciz kir.

**Em zikreşî kirin/em zikreşî bûn:**
- Em beicandin; em pir aciz kirin. Li ser dilê wî rûnişt
- Çû mala wî û êdî ranebû.

**Nan bi xwê xwê bi tam:**
- Dema yek alîkariyê ji yekî dixwaze heta aciz dike hingê jê re dibêje.

**Nan û xwê xwê bi me´ne (wate):**
- Bi heman wateyê.

**Qirik li min ziwa kir:**
- Ez pir êşandim; wisa kir tif di qirika min de nema.

**Ruhê min stand:**
- Ez pir nerihet kirim; ez pir aciz kirim; ez hêrs kirim.

**LI SER POŞMANIYÊ**

**Bi du destan li xwe da:**
- Pir poşman bû.

**Bi paş ve gav avêt:**
- Poşman bû; dev jê berda; ji biryara xwe vegeriya; tirsiya.

**Bi zimanê şewitî:**
- Ez poşman bûm ku min jê re got; xwezî min jê re negota.

**Destê xwe dax kir:**
- Tobe kir; biryar da ku careke din wî karî neke.

**Dev li tiliya xwe kir:**
- Wê gotineke nebaş bigota, lê zû feq kir ku nebaş e, negot.

**Dev li zimanê xwe kir:**
- Bi heman wateyê.

**Dîsa kumê xwe da serê xwe:**
- Dîsa karê xwe girt ser xwe.

***Azad demekê dev ji kar** berda, lê di dawiyê de dîsa kumê xwe da serê xwe.

**Gav bi şûn ve avêt:**
- Poşman bû; dev jê berda; ji biryara xwe vegeriya; tirsiya.

**Heta me xwe nas kir me emrê xwe xilas kir:**
- Ez poşman im lê êdî poşmanî bi kêr nayê; ez dereng bi xwe hesiyam.

**Heqilziman:**
- Dema yek tiştekî xwe difiroşe û pişt re poşman dibe, yê kirî jê re dibêje, tuyê heqilzimanê xwe bidî. Ango tuyê heqê poşmaniya xwe bidî.

**Lêva xwe gez kir:**
- Ji gotina xwe poşman bû.

**Li çokên xwe da/li çokên xwe xist:**
- Ji tişta kirî, yan gotî poşman bû.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Komkujiya Şaredariya Qamişlo di bîrdanka êşê de zindî ye



Di 11'ê Adara 2014'an de ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve komkujî li dijî Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo hate kirin. Di vê êrîşa hovane de hin ji xebatkar û welatiyên li şaredariyê şehîd bûn. Ev êrîş bi armanca şikandina îradeya gelan û têkbirina Rêveberiya Xweser a ku nû hatibû ragihandin, pêkhat.**R-10**

## 'Nameya Rêbertî ji bo jinan, pêşengtiya ji nasname û pêvajoya dîrokî ya siyasî re ye'



Parlamentera berê ya DEM Partiyê Ayşe Ecar da zanîn ku divê em bendewar nebin, berpirsyartiyê rakin, destê Rêber Apo xurt bikin û got, "Dema Rêber Apo vê nameyê rê dike, ji aliyekî ve hem berpirsyartiyên me zêde dike, hem jî firseteke dide me. Em dikarin pêşengtiya şoreşa nasnameya xwe bikin û hem jî pêşengtiyê ji pêvajoya dîrokî ya siyasî re bikin."**R-2**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1358 11-Adar-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# XEBATA KOALÎSYONA PARTIYAN JI BO DEMOKRASÎ Û KURDISTANEKE SERBIXWE YE

Geşedanên ku li Îran û Rojhilatê Kurdistanê rûdidin, bûne rojeva cîhanî. Erkdarî û rola partiyên Kurdî li Rojhilat di vê rewşa heyî de ji bo parastina gelê Kurd gelekî girîng e. Berdevkê Dîplomasî ya PJAK'ê li Ewropayê Zagros Enderyarî da zanîn ku şerê tê kirin nakeve xizmeta tu gelî, şerê du dewletên navnetewî ye ku dixwazin bibin hegemon û got, "Koalisyona partiyên Kurdî hat avakirin, em hewil didin di çarçoveyeke demokratîk, nenavendî û Kurdistaneke xweser de xebatê bimeşînin û bi aliyên din re li hev bikin."**R-4**




## DAIŞ dibe gefeke nû



Li gel guhertinên ku di qada herêmî de diqewimin û bûne sedema pêşketinên bilez û dramatîk, mijara çeteyên DAIŞ'ê ji nû ve derketiye holê, nemaze piştî pêşketinên meydanî yên ku di demên borî de li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine dîtin.**R-3**

## Projeyên dabînkirina avê li bajarê Qamişlo



Rêvberê Daîreya Avê ya bajarê Qamişlo Mehmûd Mehmûd destnîşan kir ku bi armanca xurtkirina çavkaniyên avê projeyên berfireh yên kolandina bîran dabûn destpêkirin û got, "Tevî zehmetiyan daîre hewil dide ku p lanên xwe yên xizmetguzarî ji bo dabînkirina pêdiviyên gel, bi cih bîne."**R-8**

## 'Rewşenbîr ditirsin ku rêveberiyeke din were û saziyên çandî paşguh bike'



Endamê DHNRKRK'ê Kemal Necim da zanîn ku Desteya Hevbeş pergaleke rêxistinî ya 5 yekîtiyên rewşenbîrî ya Kurd li Rojava ye û got, "Rewşenbîr ditirsin ku rêveberiyeke din were û saziyên çandî yên Kurdî paşguh bike. Eger çand û nasnameya Kurdî neyê qebûlkirin, dê riyeke din a pişaftinê vebe."**R-9**


Adîfe Sakik û 8'ê Adarê
Faruq Sakık R-4


Kurd kilîta guhertina tevahî Îranê ne
Dilyar Cizîrî R-6


Herikîna xwîna civakan lêçûna şeran zêde dikin
Ehmed Hesen R-7


"Pêşî li jinan, îro jin vê lîstikê xera dikin"
Gulîsta Xalid R-10

# ‘Nameya Rêbertî ji bo jinan, pêşengtiya ji nasname û pêvajoya dîrokî ya siyasî re ye’

Parlamentera berê ya DEM Partiyê Ayşe Ecar da zanîn ku divê em bendewar nebin, berpirsyartiyê rakin, destê Rêber Apo xurt bikin û got, “Dema Rêber Apo vê nameyê rê dike, ji aliyekî ve hem berpirsyartiyên me zêde dike, hem jî fîrsetekê dide me. Em dikarin pêşengtiya şoreşa nasnameya xwe bikin û hem jî pêşengtiyê ji pêvajoya dîrokî ya siyasî re bikin."

**Zana Roj**

Di pêvajoya nû û panga Rêber Abdullah Ocalan ya 27’ê Sibata 2026’an de bal hat kişandin ser entegrasyona demokratîk, her wiha rola jin di pêkanîna vê yekê de. girêdayî van xalan Parlamentera berê ya DEM Partiyê Ayşe Ecar bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**- Salek li ser banga Aştî û Civaka Demokratik re derbas bû, bi awayekî giştî xebat û gavên ku hatin avêtin hûn çawa dinirxînin?**

Belê; Salek li ser Banga aştî û Civaka Demokartîk re ya ku bi pêşengtiya Rêber Abdullah Ocalan ve hatiye destpêkirin re derbas dibe. Bi wê bangê re PKK’ê xwe fesh kir, Kongreya xwe ya 12’an lidar xist, vekişandina ji Tirkiyê û gavên bingehîn yên aştiyê avêtin. Ew pêvajo bi pêşengtiya Hevseroka KCK’ê Besê Hozat ve hate pêşvebirin. Bi rastî dema em li van geşedanan dinêrin bi taybet li gavên ku ji aliyê Rêber Apo û PKK’ê ve hatine avêtin, em dibînin ku gavên herî mezin ji bo çareserî û aştiyeke mayînde avêtine.

Di vê demê de di bin sîwana meclisa Tirkiyê de komîsyonek hat avakirin û di wê komîsyonê de partiyên alîgir ango yên di bin sîwana dewletê de cihê xwe girtin, kêm partî yên ku derveyî sîwana dewletê ne hebûn. Girseyeke mezin tevlî vê komîsyonê bû. lê belê di ast û hêviyên ku em li bendê de bûn jî nebû. Helbet ev nayê wateya ku em xebatê wan bêwate dikin ji ber kedek mezin heya niha jî tê dayîn. Her wiha cara yekemîne bi vê awayî û vê girseyê xebatek bi dewletê re tê birêvebirin. Di heman demê de Komîsyonê raporek nivîsî, me ew rapor rexne kir, weke ku pirsgirêka Kurd tenê weke pirsgirêka PKK’ê digre dest.

Lê belê pirsgirêka Kurd demdirêj e xwe dispêre sedsalan û li ser gelê kurd êrîşên hatin meşandin. Dewlet tenê PKK’ê weke sedem dibîne, PKK’ê ne sedem e, encam e. Li hember siyaseta înkar û tunekirina Kurdan PKK’ê hate avakirin. Li ser vê esasê girtina dest ji pirsgirêk û doza Kurd re ji aliyê komîsyonê tenê ku PKK’ê navend e, ev şaş e û rexneyên me pêş ketin.

Helbet di aliyê giştî de hebûn û avakirina vê komîsyonê gelekî girîng e. Cara yekemîne ku Rêberekî Kurd tê muxateb girtin. Ji ber wê yekê bi derbasbûna salekê li ser pêvajoya ku Rêber Apo destpê kiriye re re careke din peyameke nû hate belavkirin. Di vê peyama dawiyê de Rêbertî peyamê ji dewletê re rê dike ku banga xwe ji dewletê re ye, pêvajoya nêgatîf qediya û dest bi pêvajoya pozîtîf hatiye kirin. Ji îro û pêve ji bo ev pêvajo bighîne serî divê di serî de bingehek hiqûqî û siyasî were dayîn ku ev yek di zagon û mekezagonan de were eşkerekirin. Di serî de hemwelatiyeke wekhev were avakirin, ne ku weke berê kî di Tirkiyê de jiyan bike; Tirk e.

Rêbazên pişaftinê, înkarkirina nasname û cudatiyên di nava civakê de were rakirin her wiha qanûnên pêşî li siyaseta demokratîk digrin bêne rakirin. Ev yek jî bi guhertina zagonan tê kirin û pêşî li siyaseta demokrasiyê vekirin, pêkan dibe.

**- Rêber Apo di nameya xwe ya 27’ê sibata 2026’an de dibêje “Jin pêkhateya herî azadîxwaz û hêza xurtkirinê ya entegrasyona demokratîk in” hûn vê yekê çawa dixwînin û bi taybet li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê de erkekî çawa dikeve ser milê jin?**

Dema ku em li pirsgirêkên netewan dinêrin, bingehekî wî ya dîrokî heye ku xwe her tim spartiye serdest û bindestan. Rêber Apo jî dema ku hemû pirsgirêkên heyî dinirxîne di serî de vedigere dîrokê û bingeha wan pirsgirêkan radixîne ber çavan û dinirxîne. Rêber Apo di hemû pirtûk û parêznameyên xwe de ev yek nirxandiye. Îro dema ku em li pirsgirêkên di nav civakê de dinêrin, xirabûn, têkçûn û wêrankirina civakê dinêrin, hemû





jî bingeha xwe ji dîrokê digre.

Di serî de ji pêşketina fikra bindestiya jinê, fikra serdestî û bindestiya giştî di civakê de bi xwe re pêş xist.

Ji ber wê her tim Rêber Apo dema dibêje ji nû ve afirandin, xwebirêxistinkirin û xweavakirin hebe divê em dîrokê binêrin. Windakirina destpêkê jî ji jinê hatiye destpêkirin û pê re her tişt ji rastiye xwe derket. Dema em nîqaşê demokrasî, azadî û wekheviyê dikin, pêwîst e di nava pergala nû de jin hebin, bi azadî û îradeya xwe hebûna jin were esasgirtin. Dema em îro li hebûna jin di nava civakê de dinêrin, tabloya tundûtujiya ku li ser fîzîk, îrade û ramana wê tê kirin, derdikeve ber çavên me. Di giştî Rojhilata Navîn de jin ji ber nasnameya xwe ya jinbûyînê bi destê mêrê serdest tê qetilkirin. Ev yek di Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê de bi heman rengî tê kirin. Ev tundî ji aliyekî bi destê mêrên ku li ser destê dewletê hatine perwerdekirin tê kirin him jî li ser destê dewletê tê kirin.

Weke ku Rêber Apo jî tîne ziman di pêvajoya entegrasyona demokratîk, Aştî û Civaka Demokratîk de divê em jin xwe ji berê zêdetir birêxistin bikin, da ku em rola ku dikeve ser milê me bilîzin. Îro Paradîgmeya Rêber Apo bi slogana Jin, Jiyan, Azadî cîhanî dibe, jinên Kurdistanê pêşengtiya jiyana azad ji jinên cîhanê re kirine. Lewra Dema Rêbertî vê nameyê rê dike ji aliyekî ve him berpirsyartiyên me zêde dike him jî firsetekî dide me. Ji ber ku di dîrokê de mînaka vê yekê jî tune ye. Em dikarin pêşengtiyê ji şoreşa nasnameya xwe re bikin û him jî pêşengtiyê ji pêvajoya dîrokî ya siyasî re bikin.

**- Di pêvajoya pêşerojê de behsa hemwlatîbûna azad bi dewletê re hatiye kirin, gelo pêkanîna vê yekê di vê demê de bi dewletê re çiqas mumkine û divê çi ji aliyê dewletê ve bê kirin?**

Pêvajoya ku Rojhilata Navîn tê re derbas dibe di vê demê de bi taybet, tê dîtin ku ji nû ve dîzayînkirin û çêkirina nexşeyan heye. Armanca van dewletan ne ku gel bi azadî û rihetî jiyan bike ye, tenê ji bo pêkanîn û parastina berjewendiyên xwe kar dikin.

Çareserkirina pirsgirêka Kurd jî li ser dewleta Tirkiyê şert e. Îro dîtin ku ji dehên salan ve êrişên qirkirina fîzîkî, çandî û nasnameyê didin meşandin. Kurdan bi dehan salin kirine zîndanan, komkujî pêk anîne û binpêkirinên dijmirovî kirine. Lê dîtin ku bi yek carî siyaseta wan bi ser neket û Kurd tune nebûn. Îro xeteriya herî mezin li ser Tirkiyê û aboriya wê heye. Ew baş dizane ku pêwîst e bi Kurdan re were ser maseya siyasetê û ferze ku vê pirsgirêkê bi rêbazên demokratîk çareser bikin. divê em ji bîr nekin ku hin aliyên ku hebûna xwe li ser domdariya vê pirsgirêkê didomînin jî hene.

Li aliyê din weke ku koma Tevgera Azadiyê jî aniye ziman divê em bendewar nebin, divê em berpirsyartiyê bigrin ser xwe, destê Rêbertî xurt bikin da ku dewlet gavan biavêje. Ya herî girîng di vê demê de jî ku azadiya Rêber Apo ya fîzîkî pêk were, ew nebe wê hemû pilan û pêşdîtinên me kêm bimînin. Li ser wê esasê jî divê em li qadan bin, destê Rêbertî xurt bikin û li ser dewletê bandor bikin.

Ji ber vê yekê divê em di vê pêvajoyê de li bendemayînê nebin, bi taybet jin, jina ku erka wê hê girantir û zêdetire, jina ku dewlet siyasetên xwe li ser tunebûn û pelçiqandina hêza wê didin meşandin. Divê em bi gelemperî hêza xwe ya hevgritin û yekbûnê xurt bikin, xwe birêxistin bikin û di vê pêvajoyê de bibin hêza pêşengtiyê.



# Li Lubnanê koçberî û kuştina sivîlan ji ber êrişan zêde dibe

Li gorî hikumeta Lubnanê û li gorî daneyên kesên ku bi fermî li gel wê navên xwe qeyd kirine, ji destpêka şerê di navbera Îsraîl û Hizbullahê de, zêdetirî nîv milyon kes ji cih û warên xwe koçber bûne û 394 sivîl hatine kuştin.

**Navenda Nûçeyan**

Di nava êrişa berdewam a Îsraîlê ya li dijî Lubnanê de, ku heya niha şer di navebra Huzbullah û Îsraîlê de berdewam dike, berdevkê artêşa Îsraîlê fermanên valakirinê dide ku di nav de deverên berfireh û tevahiya gundên başûr û rojhilatê Lubnanê herwiha li taxên başûrê Beyrûtê. Ji ber vê yekê, hejmara kesên ku ji ber şerê di navbera Îsraîlê û Huzbullahê de koçber bûne zêde dibe. Di heman demê de hewldanên mezin têne kirin da ku aloziya koçberiyê ya ku zêde dibe çareser bikin. Hikumeta Lubnanê yekşemê di 8’ê Adarê de ragihand ku li gorî daneyên kesên ku bi fermî qeyd bûne, zêdetirî nîv milyon kes koçber bûne.



### Hejmara koçberan a giştî gihaşt 517 hezarî

Wezîra Karûbarên Civakî ya Lubnanê Hanîn Elseyid di civîna xwe ya rojane ya çapemeniyê de diyar kir ku ji destpêka êrişa dawî ya Îsraîlê ya li ser Lubnanê ve hejmara giştî ya kesên koçber ên qeydkirî gihîştiye 517 hezarî. Lê zêde kir ku li gorî daneyên heta saet 5’ê êvarî roja yekşemê 117 hezar û 228 kesên koçber li 538 stargehên hikumetê bi cih bûne. Hêjayî gotinê ye ku li gorî texmînan hatiye nîşan dan ku bi sed hezaran kesên din hîn nehatine qeydkirin.

### Ji ber êrişên li ser Lubnanê hejmara qurbaniyan gihîşt 394 kuştî

Wezîrê Tenduristiyê yê Lubnanê Rakan Nesr Eldîn roja yekşemê di 8’ê Adarê de diyar kir ku hejmara qurbaniyên êrişên asmanî yên Îsraîlê li ser Lubnanê gihîştiye 394 kesan, di nav wan de 83 zarok û 42 jin hene di heman demê de 1130 kesên din jî birîndar bûne. Wezîrê Tenduristiyê Rakan Nesredîn ragihand ku tîmên tenduristiyê jî bûn hedefa êrişan û di nava hefteyekê de 9 xebatkarên tenduristiyê hatin kuştin û êrişan bandor li ambûlansan jî kiriye di heman demê de ji ber rewşa heyî çend nexweşxane jî ji xizmetê derketine. Hêjayî gotinê ye ku di 28’ê Sibatê de, şerê di navbera Îranê, Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve dest pê kir, ku hêzên Amerîkî û Îsraîlê bi sedan cihên di hundirê Îranê de bombebaran kirin. Tehran jî bi hedefgirtina çend welatên Kendavê bersiv da û îdia kir ku li ser axa wan baregehên Amerîkî hene. Balafirên bêmirov û mûşekên Îranê li Iraq û Urdunê jî hedefgirtin. Piştî kuştina rêberê bilind ê olî yê Îranê Elî Xamineyî di êrişên Îsraîlê û DYA’yê de, Hizbullah li dijî Îsraîl û DYA’yê ket şer û eniya Lubnanê şer gur kir, mûşek û balafirên bêmirov avêtin Îsraîlê. Li hemberî vê yekê jî Îsraîlê êriş li dijî Lubnanê dan destpê kirin û ji roja Duşemê ya borî ve Îsraîlê bi pêlek êrişên asmanî li ser çend deverên başûrê Lubnanê herwiha li taxên başûrê Beyrûtê bersiv da.

# Tehranê planeke êrişkar a xeternak çalak kiriye

**Navenda Nûçeyan**

**Piştî derketina Îranê ji şerekî hişk li dijî DYE’ê û Îsraîlê di sala borî de, rêberê bilind ê Îranê Elî Xamenî û serokên dezgehên leşkerî gihîştin wê encamê ku welat hewceyî guhertinek stratejîk a biryardar e.**

Li gorî raporekê ku rojnameya Wall Street Journal belav kiriye, Tehranê planeke êrişkar a xeternak çalak kiriye ku armanca wê ya sereke ew e ku di rewşa kuştina serokên payebilind, di nav de serokê bilind bi xwe jî, mayîndetiya rejîmê misoger bike.

Berevajî rêbaza ku Îranê di du salên borî de şopandibû, ku li ser bersivên sînorkirî û rasterast ên li hember aliyê êrişkar hatiye avakirin. Tehran, li gorî vê stratejiya nû, berfirehkirina çarçoveya pevçûnê li herêmê pejirandiye, nemaze bi hedefgirtina welatên Kendava Erebî û têkbirina aboriya cîhanî, ji bo kêmkirina amadebûna serokê Amerîkayê Donald Trump ji bo dirêjkirina şer an vegera pevçûnek nû di pêşerojê de.

Ev rêbaz çalakkirina tiştê ku wekî “parastina mozaîk” tê nasîn dihewîne, ew modelek parastinê ya nenavendî ye, rê dide fermandarên meydanî ku desthilatên fireh bigrin ji bo domandina şer her çend ew ji fermandariya navendî qut bibin jî.

### Lêvegerek piştî şerê 12 rojan

Îranê ev stratejî piştî şerê 12 rojan yê li dijî Îsraîlê di Hizîrana borî de aktîv kir, piştî ku serokatiya Îranê gihîşt wê encamê ku rêbaza wê ya berê şaştiyeke stratejîk dihewîne. Tevî ku xwe ji şerekî mezin xilas kir, ku di encamê de hejmareke mezin ji serkirdeyên leşkerî hatin kuştin û hin beşên ji bernameya wê ya nukleerî di bin kavilan de veşartin di heman demê de beşek mezin ji parastinên wê yên hewayî wêran kirin, ew di nav çerxek ji têkçûna dubarekirî ya bi Îsraîl û Dewletên Yekbûyî re asê maye, her carê qelstir û eşkeretir derdikeve holê, herwiha dijberên wê di hedefgirtina wê de wêrektir dibin. Ji vir û pê ve, ji bo Tehranê eşkere bû ku berdewamiya bi rêbaza berê êdî ne mimkun e.

### Peyam û hişyariyên ji bo welatên cîran

Nîşanên vê guhertinê ji meha Cotmehê ve dest pê kirin, dema ku rayedarên Îranî hişyarî dan ku her bersivek li hember êrişeke nû dê ne wekî yên berê be. Li gorî çavkaniyên rojnameyê yên di nav rayedarên Ereb de, Îranê peyamên taybet bi rêya kanalên dîplomatîk ji cîranên xwe re jî ragihand û diyar kir ku eger şer ji nû ve dest pê bike, ev welat dê li eniyên pêş bin.

Beriya gera dawî ya danûstandinên nûkleerî di meha Sibatê de, Elî Larîcanî, serokê Konseya Bilind a Ewlekariya Neteweyî ya Îranê, bi rêya Omanê peyamek ji Dewletên Yekbûyî re da û diyar kir ku Tehran êdî wê bi awayekî êrişkar bersivê bide dema ku li dijî wê êriş bên destpêkirin.

Çavdêr dibînin ku yek ji sedemên vê guhertinê ew e ku di nav Îranê de baweriyek zêde dibe ku bersivên wê yên berê pir sembolîk û sînordar bûn.

Di vê çarçoveyê de, Trita Parsi, cîgira serokê Peymangeha Quincy li Washingtonê, got ku di nava rayedarên Îranî de hestek xurt heye ku Tehran di pevçûnên berê yên bi Îsraîl û Dewletên Yekbûyî re, bi awayekî sembolîk û sînordartir bersiv da. Lê zêde kir ku nêrîna




niha ya Îranê li ser vê rastiyê ye ku heya ku hemû hîs nekin ku şer pir biha bû, ti agirbest nikare bidome.

### Parastina mozaîkê

Îran girîngiya herî mezin dide mayîndebûnê, ji ber vê yekê modela “parastina mozaîk” ku cara yekem di sala 2005’an de hate ragihandin, çalak kiriye.

Ev yek li ser dersên ku ji operasyonên Amerîkî li Iraq, Efxanistan û Belqan herwiha ji şerê 2007’an di navbera Îsraîl û Hizbullahê de hatine girtin, hatiye avakirin, ku tê de hêzên çekdar ên qelstir karîn bi wergirtina derbeyan û hedefgirtina xalên wan ên herî qels dijberên bihêztir westînin. Pasdarên Şoreşa Îranê li 31 navendên fermandariyê belav bûne, yek ji bo paytextê û yek ji bo her 30 parêzgehan, ev yek dihêle ku ger serokatiya payebilind bê kuştin, desthilat bi lez were veguheztin.

Herwiha ev yekîne ji erdnîgariya Îranê sûd werdigirin û xweperwerde dikin, ku li navendên nifûsê û xetên sereke yên danûstendinê di kûrahiya welêt de belav bûne herwiha ji ber rêzeçiyayan her xetên dabînkirina tu hêzek dagirker ji bo êrişê hedef digre.

Wekî din rola hêzên Besîc jî heye, ew jî formasyoneke nîvleşkerî ye ku ji sed hezaran dilxwazan pêktê û li tax, bajar û mizgeftan hatiye bicihkirin, ev yek dihêle ku rêjîm her cûre nearamiya navxweyî kontrol bike.

# Komkujiya Şaredariya Qamişlo di bîrdanka êşê de zindî ye

Di 11'ê Adara 2014'an de ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve komkujî li dijî Şaredariya Gel a bajarê Qamişlo hate kirin. Di vê êrişa hovane de hin ji xebatkar û welatiyên li şaredariyê şehîd bûn. Ev êriş bi armanca şikandina îradeya gelan û têkbirina Rêveberiya Xweser a ku nû hatibû ragihandin, pêkhat.

**Navenda Nûçeyan**

Her sal di roja 11'ê Adarê de, êş ji nû ve tê jiyîn û wêneyên komkujiya çeteyên DAIŞ'ê ya li ser Şaredariya Qamişlo di sala 2014'an de ku tê de hin karmend û welatiyên şaredariyê şehîd bûn, vedigerin bîra mirov. Vê komkujiyê xemgînî û êşek mezin hişt ku heta niha jî baş nebûye. Kesên şahidiya wê kirine, herî zêde bandor bûne, ji ber ku dîtin ne wekî bihîstinê ye û ew sûc ji bo malbatên şehîdan çavkaniya êş û windahiyê ye, sûcdar hîn jî cezayê xwe yê adil negirtiye.

### Karmend û sivîlên bêguneh bûn armanca êrişên terrorist

Di sibeha 11'ê Adara 2014'an de, çeteyên DAIŞ'ê li Şaredariya Qamişlo ku li Findeq Hedaya bû, komkujî pêkanîn. Di Findeqê de ofîsên xizmetê yên wê demê yên Şaredariya Navendî ya Qamişlo hebûn ku wê demê bi Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê ve girêdayî bû. Êriş ji aliyê sê xwekujên çeteyên DAIŞ'ê ve hat kirin ku kemberên teqemenî li xwe kiribûn. Di encama vê yekê de karmend û mêvanên şaredariyê, sivîlên bêguneh ku ji wan 5 jin bûn, hatin şehîdxistin û gelek jî birîndar bûn.

### Bûyera komkujiya şaredariyê

Ofîsên şaredariyê wê rojê wekî her roj, wekî her carê, dixebitîn. Lê bi êrîşeke çekdarî ya komeke terorîstan a DAIŞ'ê matmayî man, ji ber çeteyên DAIŞ'ê berî ku debasî şaredariyê bibin, çavdêrê li ber derî şehîd xistin. Piştre derbasî şaredariyê bûn. Dema derbas dibin şehîd Fehed xwe dide pêşiya wan, da ku wan bigre, çeteyek xwe diteqîne û Fehed şehîd dikeve. Çeteyên DAIŞ`ê ketin avahiyê û destpêkê bi çekan xebatkarên şaredariyê kirin hedef, bombe avêtin odeyan û mayînên li ser xwe teqandin. Bandor û êşa vê komkujiyê hîn jî di dilê kesên ku şahidiya wê kirine, zindî ye. Şaredarî ne saziyeke leşkerî bû, saziyeke sivîl bû ku Kurd, Ereb û Suryan lê dixebitîn. Herwiha cara yekê bû ku çeteyên DAIŞ'ê saziyekê bi vî rengî dikirin hedef.

### Êşa bûyera 11'ê Adarê heya roja tê jiyankirin

Di vê êrişa hovane de, Îbrehîm Ezîz ku di avakirina Şaredariya Qamişlo de xwedî kedeke mezin bû, Rewşen Mihemed Zekî, Fehed Ebdulezîz, Mûsa Azad Mûsa, Elî Bora, Cîhan Mûrad, Emîna Bîlal, Ferhad Ebdulezîz Osman, Elaedîn Ebdulîllah, Awaz Mehmûd Mihemed û Helebçe Xelîl ku ducanî bû, şehîd bûn. 12 sal li ser komkujiya Şaredariya Qamişlo derbas dibin, lê heta niha jî êş û xemgîniya vê rojê di dilê endamên şaredariyê û gelê bajarê Qamişlo de weke roja bûyerê ye.

### Têkçûna Rêveberiya Xweser armanca her êriş û planekê bû

Çi êrişên ku piştî damezrandina Rêveberiya Xweser hatin kirin, hemû bi yek armancê bûn, ew jî ku vê rêveberiyê hilweşîne û aramiya herêmê ya ku hatibû avakirin, têk bibe. Şer û êrişa herî dawî jî li herêmê rû da, dîsa ev yek piştrast kir ku her kes projeya Rêveberiya Xweser xerab bike. Di heman demê de çeteyên girêdayî Tirkiyê û hikumeta demkî, çeteyên DAIŞ'ê yên bi salan li gel rêveberiyê û QSD'ê girtîne ew berdan, di encamê de em dibînin îro roj ev çete çawa li Sûriyê zindî bûne û tevgera wan hêdî hêdî dibe mîna 2014'an. Ev yek ne tenê li ser gelê




Sûriyê xeteriye, lê ji bo hemû cîhanê dîsa metirsî ava kiriye.

### Komkujiya Şaredariyê her sal tê bîrxistin

Hêjayî bibîrxistinê ye ku şaredarî her salê di 11'ê Adarê de xebatkarên xwe yên ku di komkujiyê de şehîd bûn, bi bîr tîne. Herwiha ziyareta gorên wan dikin û mûman pêdixin.

## "Pêşî li jinan, îro jin vê lîstikê xera dikin"



Gulîstan Xalid

8'ê Adarê, Roja Jinan a Cîhanê ku her sal tê pîrozkirin, ne tenê rojek bîranîn an pîrozbahiyê ye. 8'ê Adarê sembola têkoşîna ku jinan di tevahiya dîrokê de ji bo wekhevî, azadî û rûmetê dane ye. Ev roj rojek berxwedanê ye ku keda jinan tê xuyang kirin, zilm û zordariya ku jinan kişandiye tê bîranîn, û têkoşîna ji bo cîhanek dadperwertir tê zêdekirin.
Di tevahiya dîrokê de, dema ku pergalên serdest û avahiyên desthilatdar dixwestin civakan kontrol bikin, wan di destpêkê de jin hedef girtin. Ji ber ku jin ne tenê takekesek e; ew di heman demê de hêzek bingehîn e ku çand, ziman, nirx û pêşeroja civakê hildigire. Sînordarkirina azadiya jinê di rastiyê de tê wateya kontrolkirina nîvê civakê. Ji ber vê yekê, jin pir caran qurbaniyên yekem ên şer, polîtîkayên zordar û newekheviyên civakî bûne. Gotina "Pêşî Li jinan Dan" kurteyek bihêz a vê rastiya dîrokî ye. Lêbelê, dîroka jinan ne tenê dîroka zordarî û mexdûriyetê ye. Ew di heman demê de dîroka berxwedan, hevgirtin û veguherînê ye. Li gelek deverên cîhanê, jinan ji bo mafên xwe yên perwerde, kar, temsîliyeta siyasî û wekheviya civakî têkoşîn kirine û destkeftiyên girîng bi dest xistine. Îro, xuyabûna jinan di hemû warên jiyana civakî de encama vê têkoşîna dirêj e.
Rola jinên Kurd di vê têkoşînê de jî pir girîng e. Jinên Kurd hem li dijî newekheviyên ji ber zayenda wan û hem jî li dijî pirsgirêkên siyasî û civakî yên ku gelê wan pê re rû bi rû ye, têkoşînek dualî dane. Bi taybetî di salên dawî de, tevgera jinên Kurd bi hêza xwe ya rêxistinî, çanda hevgirtinê û îdiaya veguherîna civakî di nav tevgerên jinan ên cîhanî de ezmûnek berbiçav pêşkêş kiriye. Rêxistinên jinan ên ku pêş ketine, bi taybetî li Rojava, nîşan dane ku jin dikarin di siyaset, rêveberiya herêmî, parastinê û gelek warên jiyana civakî de rolek çalak bilîzin. Nûnertiya wekhev a jinan, modela rêveberiya hevbeş û xurtkirina saziyên jinan nîşan dane ku rizgariya jinan ne tenê dikare bibe dirûşmeyek, lê dikare bibe modelek civakî ya berbiçav. Ji ber vê yekê, têkoşîna jinên Kurd îro wekî ezmûnek îlhambexş ji bo tevgerên jinan li gelek deverên cîhanê tê dîtin.
Gotina "Îro, jin vê lîstikê têk dibin" vê rastiyê bi awayekî şênber nîşan dide. Jin êdî ne tenê weke beşeke civakê ya ku rastî zilmê tê; ew bûne pêşengên sereke a ku guhertinên civakî rêve dibe. Rêxistinbûna jinan, hevgirtina wan û daxwaza wan a azadiyê hêzekê diafirîne ku pergalên li ser bingeha newekheviyê lêpirs dike û diguherîne. Têkoşîna jinan ne tenê ji bo jinan e. Rizgarkirina jinan di heman demê de tê wateya demokratîkkirina civakê û pêşerojek dadperwertir ji bo mirovahiyê. Ji ber vê yekê, 8'ê Adarê rojeke ku divê ne tenê ji hêla jinan ve, lê ji hêla her kesê ku cîhanek azad û wekhev dixwaze ve were hembêz kirin. Di encamê de, dibe ku di seranserê dîrokê de hêz hebûne ku xwestine jinan bêdeng bikin. Lêbelê, îro, jin bi hevgirtin û têkoşînê vê lîstikê têk dibin. Wekî li gelek deverên cîhanê, jinên Kurd di pêşengiya vê têkoşînê de ne û nîşan didin ku jiyanek azad mimkun e.

# 12'ê Adarê... birîna vekirî di bîranîna gelê Kurd de

**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Di sala 2004'an de, Kurdên li Qamişlo li dijî rejîma Baas a zordar serhildan kirin, ji dema ku hatibû ser desthilatê ve neheqî li gelê Kurd dikir, hebûna Kurdan li ser axa wan a dîrokî red dikir û bi berdewamî hewl dida nasnameya Kurdî ji holê rake.**

Bûyer di 12'ê Adara 2004'an de, piştî maçek futbolê ya di navbera Yaneya El Cîhad a ji Qamişlo û Yaneya Elfutuwa ya ji Dêrazorê de dest pê kirin. Piştî danûstandina slogan û dirûşmeyan bi tonên neteweperest û siyasî, di hundirê stadyûmê de alozî derket, berî ku hêzên ewlehiyê rasterast mudaxele bikin. Piştî ku qurbaniyên pêşîn hatin ragihandin, pevçûnên sînorkirî zû veguherin xwepêşandanên berfireh li bajêr.
Li gorî raporên rêxistinên mafên mirovan ên herêmî û navneteweyî, di rojên pêşîn ên xwepêşandanan de herî kêm 30 kes hatine kuştin, lê hin çavkaniyên Kurdî hejmarên hîn bilindtir ragihandin. Bi sedan xwepêşander jî birîndar bûn û girtinên berfireh de ku li gelek bajar û bajarokên parêzgeha Hesekê û heta Heleb û Şamê hatin kirin, zêdetirî 2,000 kes hatin girtin.

### Paşxaneya siyasî û civakî

Serhildan ne bûyerek xweber bû, lê belê encama polîtîkayên dehsalan ên li dijî Kurdan, bi taybetî di dema desthilatdariya Baas a Sosyalîst a Ereb de, bû. Di nav pirsgirêkên herî berbiçav ên çaresernekirî yên wê demê de serjimêriya awarte ya 1962'an bû, ku bi deh hezaran Kurd ji hemwelatîbûna wan a Sûriyê bêpar kir, wan ji mafên bingehîn ên kar, xwedîkirina milk û wergirtina perwerdehiyê bêpar kir. Kurdan herwiha ji qedexeyên li ser bikaranîna zimanê xwe di saziyên fermî de, qedexeyên li ser pîrozkirina eşkere ya hin cejnên neteweyî û polîtîkayên ji nû ve bicihkirin û guhertina demografîk li hin deverên sînor êş kişandin. Van faktoran bi hev re bûn sedema afirandina hestek nerazîbûne, ku di kêliyek bêaramiyê de di 12'ê Adara 2004'an de derket holê.

### Xwepêşandan belav bûn

Di nav çend rojan de, xwepêşandan belavî bajar û bajarokên din ên Kurdan bûn, ku bi hezaran xwepêşander di dema merasîmên cenazeyan de veguherin meşên hêrsbûyî. Li hin deveran pevçûnên rasterast di navbera xwepêşanderan û hêzên ewlehiyê de, herwiha şewitandina avahiyên hikumetê û sembolên fermî çêbûn.
Ji bo şîna kesên ku di roja yekem de jiyana xwe ji dest dan, bi hezaran niştecihên Qamişlo, gundewarên derdora wê û bajarokên nêzîk di nav hêrsa gel a berfireh de derketin kolanan. Hêzên ewlehiyê di destpêkê de gule ber bi hewayê ve avêtin, piştre rasterast şîniyan hedef girtin, di encamê de qurbaniyên din çêbûn. Bersiva hêzên ewlehiyê ji bo xwepêşandanan, merasîma cenaze veguherand xwepêşandan û nerazîbûnên girseyî yên gelêrî ku li bajarên cûrbecûr ên Kurdan belav bûn, di nav de Amûdê, Dirbêsiyê, Tirbespiyê, Dêrik, Serêkaniyê, Kobanê, Efrîn, Zanîngeha Helebê, taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û paytext Şamê. Di 14'ê Adarê de, xwepêşandanek mezin li Kobanê pêkhat, Hêzên ewlehiyê yên Sûriyeyê mudaxele kirin, gule li



xwepêşanderan reşandin û çend kes birîndar kirin. Ev heta 31'ê Adarê berdewam kir, dema ku hêzên ewlehiyê li bajêr kampanyayek girtinê ya berfireh dest pê kir.
Di 16'ê Adarê de, bi hezaran niştecihên Efrîn ji bo hevgirtinê bi Qamişlo û bajarên din re, ku bi xwepêşandanek girseyî li taxa Eşrefiyê ya bi piranî Kurd a Helebê re hevdem bû, derketin kolanan. Xwepêşandan hefteyekê berdewam kirin, piştî wê hêzên ewlehiyê yên Sûriyê li deverên Kurdan dest bi kampanyayek berfireh a girtinê kirin. 60 xwendekarên Kurd ji zanîngehên Sûriyeyê demekê hatin derxistin, di nav de 11 xwendekarên ku bi awayekî daîmî ji zanîngehê hatin derxistin.
Niha, piştî damezrandina Rêveberiya Xweser li Qamişlo, her sal di heman rojê de û li heman stadyûmê maçek di navbera her du yaneyan de tê lidarxistin, ku sembola girêdanên dostaniyê di navbera niştecihên her du herêman de ye. Navê stadyûmê Stadyûma 12'ê Adarê bû ji bo bîranîna qurbaniyên ku di bûyerên ku Kurd wekî serhildanek li dijî hêzên ewlehiyê yên Sûriyeyê bi nav dikin de mirin.

### Bandor û bîranîn

Her çend rayedaran di nav çend hefteyan de karîn xwepêşandanan kontrol bikin jî, bandorên wan ên siyasî û civakî bi tundî hatin hîskirin. Serhildana 12'ê Adarê astengiya tirsê ji bo beşek mezin ji nifûsa Kurd şikand û hesta pêwîstiya bi rêxistinkirina siyasî û daxwaza mafên vekirî xurt kir. Herwiha beşdarî ronîkirina pirsgirêka Kurdên Sûriyeyê di asta herêmî û navneteweyî de bû.
Di salvegera 12'ê Adarê de, pirsên li ser hemwelatîbûn, nasname û mafan ji nû ve têne vegotin û navên qurbaniyan şahidên qonaxekê dimînin ku ji bîra kolektîf nayê jêbirin, qonaxek ku piştrast kir ku dengê gel, her çend ji bo demekê lawaz be jî, hîn jî dikare vegere û mafê xwe yê rûmet û naskirinê bixwaze.



# DAIŞ dibe gefeke nû

Li gel guhertinên ku di qada herêmî de diqewimin û bûne sedema pêşketinên bilez û dramatîk, mijara çeteyên DAIŞ'ê ji nû ve derketiye holê, nemaze piştî pêşketinên meydanî yên ku di demên borî de li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatine dîtin.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Pêşketina meydanî yên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatin dîtin, bûn sedema revîna hejmarek ji van çeteyan ji zindan û navendên ragirtinê yên Sûriyê ku ew lê diman, herwiha ji kampa Hol bi salan malbatên van kesan diparastiye. Ev yek careke din fikaran li ser çeteyên DAIŞ'ê derdixe holê ku ji rewşa xerabûna ewlehiyê û tevliheviya siyasî ya li Sûriyê sûd werdigirin, ku wan han daye ku êrîşên xwe dijwartir bikin û refên xwe ji nû ve birêxistin bikin û xetera ku ev çete niha ji bo Sûriyê û cîhanê çêdikin, derdixe holê.

### DAIŞ di navbera têkçûn û vejînê de ye

Têkçûna DAIŞ'ê di hemleya Baxozê de di Adara 2019'an de gavek bû ber bi jiholêrakirina tiştê ku wekî xelîfetiya qaşo dihat nasîn. Her çend ev serkeftina meydanî ya Hêzên Sûriya Demokratîk çeteyên DAIŞ'ê ji kontrola wan a erdnîgarî bêpar kir jî, ev yek nebû sedema bidawîbûna tevahî ya gefa DAIŞ'ê, ji ber ku ew di van salan de li deverên sînorî yên di navbera Sûriye û Iraqê de çalak ma, ji bilî berfirehkirina bandora xwe li welatên Afrîka û Asyayê û destpêkirina êrîşan li dijî Ewropayê. Texmînên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di sala 2024'an de nîşan didin ku nêzîkî 2 hezar û 500 endamên çalak li Sûriye û Iraqê mane, di heman demê de raporek Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî diyar kir ku heta Tebaxa 2025'an 3 hezar endamên çalak li Sûriye û Iraqê mane. Tevî ku DAIŞ rêberên xwe winda kiriye û hêmanên mayî jî qels in, ew xwedî şiyana tevgerê ne, nemaze li Sûriyê, bi taybetî piştî hilweşîna rejîmê û piraniya wan ji bo veşartina çalakî û tevgera xwe ketine nav refên hêzên ewlehî û parastinê.
Ji bilî van amaran, di 28 navendên ragirtinê yên QSD'ê de zêdetirî 10 hezar çeteyên DAIŞ'ê hebûn, di nav wan de serkirdeyên herî xeternak ên DAIŞ'ê jî hebûn, ji ber ku ji sedî 64 ji wan Sûrî, ji sedî 19 Iraqî û ji sedî 17 jî biyanî ji zêdetirî 50 welatan bûn. Tenê zindana, ku yek ji mezintirîn zindanên ku endamên DAIŞ'ê, lê ne tê hesibandin, di navbera 3,000 û 5,000 girtî tê de bûn û ew li taxa Xuweyran a Hesekê ye. Di sala 2022'an de di hewldanek bêhêvî de ji bo berdana van kesan rastî êrîşeke tund hat. Lê tevî hemû hewildanên têkçûyî yên di demên berê de, pevçûnên dawî yên di navbera hêzên hikûmeta demkî û hêzên QSD'ê de bûn sedema revîna nêzîkî 1500 endamên DAIŞ'ê ji girtîgeha Şedadê li Hesekê, ku hikûmetê diyar kir ku wê dîsa nêzîkî 80 endam girtine.
Raporan destnîşan kirin ku hin endam reviyan çola Sûriyê û deverên sînorî yên di navbera Dêrazorê û Hesekê û sînorê Iraqê de, ji ber ku ev dever xwedî erdnîgariya dijwar in. Raporên NY, herwiha fikarên li ser îhtîmala ku hin endamên biyanî birevin û vegerin welatên xwe yên li Ewropayê, an jî koçî welatên wekî Lîbya, herêma Sahel a Afrîkayê û Afganistanê bikin, ku komên girêdayî DAIŞ'ê li van welatan hene.

### Tirsa ji vejîneke muhtemel

Êrîşên dawî yên çeteyên DAIŞ'ê li hin deverên erdnîgariya Sûriyê îhtîmala hejmarek sînaryoyan eşkere dike ku xetera êrîşên terorîstî yên nû zêde dibe, nemaze di ronahiya rêzek ji aloziyên ewlehiyê di hundirê Sûriyê de, herwiha nakokiyên herêmî û navneteweyî de, ku dibe sedema zêdebûna asta rageşiyê li deveran. Ev operasyon herwiha nîşan didin gelek tiştan, ku hin ji wan bi têkçûna hikûmeta demkî ya Sûriyê ve girêdayî ne ku bigihîje astek ewlehî, aramiya siyasî û civakî û yên din jî bi hebûna hawîrdorekê ve girêdayî ne ku tê de şert û mercên ji bo bilindbûn an jî jinûvederketina DAIŞ'ê têne peyda kirin.Bi derketina holê ya rastiyek nû li herêmê, xetereyên vegera çekdarên biyanî yên DAIŞ'ê bo Ewropayê zêde dibin, ji ber rewşa siyasî û ewlehiyê ya guherbar li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û revîna gelek ji wan ji sînorê Sûriye-Îraqê. Ev yek potansiyela ji nû ve kombûna şaneyên razayî, tevgera li ser sînor, bikaranîna aqilê sûnî ji bo propagandaya tundrew û karanîna teknolojiyên nûjen ên wekî dron ji bo pêkanîna êrîşên li ser sînor nîşan dide.
Karbidestên Yekîtiya Ewropî ji vegera hêmanên rêxistinî û terorîst ên herî xwedî ezmûn û rêberiya gurên tenê bi rêya kanalên ragihandinê yên şîfrekirî ditirsin ku rêxistin bi gelemperî ji bo dayîna talîmatên xwe ji şaneyên ku ew ji bo pêkanîna ajendayên xwe yên terorîstî xwe dispêre wan bikar tîne. Nerazîbûnên dawî, herwiha fikaran li ser îhtîmala gihîştina Ewropayê bi rêyên kevneşopî, bi revîna ji Tirkiyeyê û Rojhilatê Deryaya Spî û ber bi Yewnanistan, Balkanan û Ewropaya Navîn ve, derdixin holê. Ev hemû fikar daxwazên gelek ji aliyê Fransa, Almanya, Brîtanya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve, di Çileya 2026'an de, ji bo dûrketina ji valahiyek ewlehiyê û berdewamkirina hewldanên ji bo şerê li dijî DAIŞ'ê li Sûriye û Iraqê, rave dikin û hişyarî didin ji dubarebûna rewşên revîna hêmanên terorîst. Fransa polîtîkayên hişk di vegerandina hêmanên DAIŞ'ê ji kamp û zindanên li Sûriyeyê de, bi vegera hejmareke sînorkirî ya zarok û jinan, pêk tîne. Fransa darizandin û lêpirsîna kesên vegeriyayî yên DAIŞ'ê û malbatên wan dispêre dozgeriya dijî-terorê, wekî rêyek ji bo rûbirûbûna hêmanên terorîst ên vegeriyayî ger delîl hebin. Ew piştgirî dide fona FIPD, ku berpirsiyarê fînansekirina projeyên ji nû ve vejînê û bernameyên pêşîlêgirtina civakê ye, hemî ji bo dûrketina ji dubarebûna senaryoyên operasyonên terorîstî yên ku Parîsê berê ji wan êş kişandibû.
Ji ber vê sedemê, di Çileya 2026'an de, hevpeymaniya navneteweyî ya bi serokatiya Amerîkayê veguhestineke hevrêzkirî ya nêzîkî 7,000 girtiyan ji zindanên Sûriyeyê bo Iraqê pêk anî da ku girtina wan bi ewlehî misoger bike. Koma yekem 150 şervanên DAIŞ'ê di nav wan de serokên navdar ên rêxistinê hebûn, ku piraniya wan ji neteweyên Ewropî bûn.
Di 24'ê Çileya 2026'an de, bi sedan girtî di koma duyemîn de hatin veguhestin û li ser sê zindanên Iraqê hatin belavkirin. Hevpeymaniyê bi rayedarên Iraqê re hevrêzî kir da ku veguhestina wan ji sînor ber bi tesîsên ewlehiya bilind ên li Iraqê hêsan bike. Herwiha bal kişand ser hevrêziya ewlehî û dîplomatîk bi Hêzên Demokratîk ên Sûriyeyê re li deverên binçavkirinê û kampên ku şervanên DAIŞ''ê û malbatên wan lê dihatin girtin.





### Xeterî hîn bi dawî nebûye

Gef bi ji nû ve rêxistinkirina çeteyên DAIŞ'ê, bikaranîna valahiya ewlehiyê û guhertina bandora siyasî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji QSD'ê bo Hikûmeta Demkî têne nîşandan, ku dibe ku êrîşên li ser kemînên ewlehiyê û karwanên leşkerî zêde bike. Herwiha tirsên ku şaneyên DAIŞ'ê xwe li çola Sûriyeyê û li ser sînorê Sûriyeyê-Iraqê bi cih bikin û operasyonên xwe yên li dijî binesaziya her du welatan bi karanîna otomobîlên bombekirî berfireh bikin û torên xwe yên herêmî bi hêmanên reviyayî yên li derveyî Sûriyeyê û Iraqê re bi rêya ragihandinê bi rêya kanal û amûrên ragihandinê yên şîfrekirî ji nû ve girêbidin, ku dibe ku bibe sedema belavbûna pêla terorîzmê ya sînor-derbasbûyî.

# ‘Li Rojhilatê Kurdistanê di çarçoveya demokrasî û konfedralîzmê de xebat tê meşandin’

Berdevkê Dîplomasî ya PJAK'ê li Ewropayê Zagros Enderyarî da zanîn ku şerê tê kirin nakeve xizmeta tu gelî, şerê du dewletên navnetewî ye ku dixwazin bibin hegemon û got, “Koalisyona partiyên Kurdî hat avakirin, em hewil didin di çarçoveyeke demokratîk, nenavendî û Kurdistaneke xweser de xebatê bimeşînin û bi aliyên din re li hev bikin.”

**Esma Misrefa**

Berdevkê dîplomasî ya Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê PJAK’ê Ewropayê Zagros Enderyarî, der barê geşedanên li Îranê û aliyên Kurdistanî de bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**Li Îran û Rojhilatê Kurdistanê him serhildana gel û him jî êrişên hêzên hegemon gihîştin hev. Gelo hûn rewşa ku ji du heyvan ve li Îranê tê jiyankirin çawa dixwînin û ger wiha berdewam bike wê encamên çawa bi xwe re derxîne?**

Li Îranê her tim daxwaz û nerazîbûna gel ji bo jiyaneke baştir û welatekî demokratîk hatiye dîtin. Bi taybet di 50’î salên dawiyê de di nava sîstem û rêjîma heyî de jiyaneke pir zehmet him di aliyê siyasî û him jî civakî de hatiye jiyankrin. Ji ber wê car caran, di demên cuda û di parçeyên cuda de her tim serhildan hatine çêkirikirin. Lê belê piştî serhildana Jin, Jiyan, Azadî ya 2022’an de êdî miletê Îranê bi yek dengî rabûn ser xwe û daxwaza rêveberiyeke baştir, demokratîktir û rêveberiyeke siyasî ku tê de bikaribin beşdar bibin. Me dît ku şoreşa Jin, Jiyan, Azadî beriya çar salan çawa ji aliyê hikumetê ve hate bersiv dan. Bi hezaran kes Şehîd, girtî û hatin darvekirin her wiha bi hezaran gel û ciwan ji ber siyaseta girtinê ji mal û welatê xwe koçebr bûn.
Sala Borî heyanî meha 12’a careke din serhildanên gel hatin li darxistin, bi van serhildanan gel nerazîbûna xwe ya li hember Îranê nîşanda û deh, pazdeh rojan dirêj kir bi taybetî di roja 8-9’ê meha Çile de bi hezaran kes kuştin û qetlîamên gelek mezin di Îranê de hatin pêk anîn. Niha jî civakên li Îranê heman daxwaz û mafên xwe dixwezin, Îraneke hevgirtî, demokarîk û bi hev re jiyan bikin dixwazin. Lê belê me dît ku rêjîm îzna wê yekê nade.
Di vê şerê dawiyê de, şerê Îsraîl û Îranê rewş gelek zehmet kiriye. Niha mirov dikare bêje ji ber ku şer, zehmetî û di her alî de tengasî heye, serhildana gel nîne niha rewşa şer derketiye holê. Li gelek bajaran elektrîk, xwarin pêdiviyên jiyanê nîn in. ji ber wê yekê ez bawer nakim ku ev serhildan zû bighîne armancên xwe, lê ev gel heyanî gihîştina mafê xwe wê li ber xwe bidin. Lê divê ev liber çav bê girtin ku wê ev şer çawa bibe û bi çi encaman bidawî bibe, girîng e.

**Bi hemdemiya aloziya ku di nava Îranê de tê jiyankirin, yekbûna partiyên Kurd hate kirin, hûn vê yekê çawa dinirxînin û heya kîjan astê dikare bibe aliyê çareseriyê û temsîlkirina gelê Kurd di nava siyaseta Îranê de?**

Belê; ji bo hevgitina partiyên Kurdî û koalisyona di navber şeş partiyên siyasî yên li Rojhilat hatiye çêkirin de. Dema şoreşa Jin, Jiyan, Azadî hatiye rakirin, xwestekekî Kurdan hebû ku partiyên Kurda bibin yek. Ji dema Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî de civaka Kurd pêşengtiyê ji hemû çalakî, tevger û rêxistinên civakî û siyasî yên di îranê de dike. ji bo wê xwestekekî di aliyê civakê de hebû ku hemû partî û parçeyên Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bibin yek, him pêşengtiyê ji civaka Rojhilat re bikin him jî ji civaka Îranê re.
Di van deman de hinek xwestek û karên hevbeş hatin kirin. Bi hev re daxuyanî didan bi hev re bangawaziya li gel hat kirin ku tevlî pêvajoya giştî bibin. Her wiha di destpêka 2025’an de mr komîsyonek li ser navê Navenda Diyaloga Partiyên Rojhilatî Kurdistan avakir, heft partiyên siyasî tê de cih girtin. Di navenda diyalogê de mirov dikarebêje Heft partiyên sereke û aktîv yê Rojhilat tê de cih girtin. Piştî ku navendê nêzî 11 mehan kar û xebat da meşandin. lihevkirinek hate kirin ku hevpeymaniyek di navbera hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê bê çêkirin. Destpêkê pênc partî ji wan heft partiyan tevlî bûn, piştre partiyên din jî tevlî bûn. Niha koalisyon ji 6 partiyan pêk tê (Partiya Jiyana Azad a Kurdistan PJAK, Partiya Demokratî Kurdistan Îran PDK-Îran, Partiya Azadiya Kurdistan PAK, Partiya Xebat, Komeleya Şoreşgerên Îranê û Komeleya Zehmetkêşanê Kurdistanê-Îran) niha tenê yek partî derveyî koalisyonê maye ew jî Rêxistina Kurdistanî ya partiya Komunîst ya Îranê ye. Ev koalisyon ji bo ku em bikaribin ji bo demokratîkbûna Îranê, ji bo xwesertiya Rojhilatî Kurdistan ku em bi awayekî nenavendî û konfedral rêveberiya xwe avabikin, hatiye avakirin û xebat dike.

**We di hevdîtineke xwe de anî bû ziman ku li Îranê gelê herî birêxistinkirî Kurd in, her ku Îran dikeve tengasiyê êrişî Kurdan dike. Gelo yekgirtina partî û gelê Kurd di Îranê de wê bibe sedema êrişan?**

Di nava civaka Rojhilatê Kurdistanê de nêzî sed salî tê de rêxistinên siyasî û partî xwe birêxistin kirine daku bikaribin mafê xwe yê siyasî û civakî bi dest bixin. Bi derketina partiyên siyasî yên modern re ev yek berdewam kiriye. Herî kêm 50’î sal in li Rojhilatê Kurdistanê xebatekî siyasî û civakî bê navber tê meşandin. Li Rojhilatê Kurdistanê li gorî parçeyên Îranê him tevgerekî siyasî ya xutr heye him jî tevgerekî civakî ya birêxistinkirî heye. weke berfirehbûna rêxistina Kurdan, raste em dikarin bêjin ku yên herî birêxistinkirî ji parçeyên din yên Îranê ne. Tevgerekî siyasî ya zindî li wir heye û xwediyê xebatekî durûdirêj di nava siyaset û civakê de ye.
Bi taybet piştî Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî ku bi pêşengtiya PJAK û felsefeya Jin, Jiyan, Azadî pêş ket, em bûn mînak û pêşeng ji bo hemû gelê Îranê re. Ji wê demê ve ev taybetmendiya gelê Kurd ya ku dikarin pêşengtiyê ji bo hemû civaka Îranê bikin, zêde derket pêş. Her wiha bi hevgirtina koalisyon ku hatiye avakirin, tevgera siyasî ya Kurdî ya rizgarêxwaza gelê Kurd li Rojhilat bûye mînak ji netewên weke Belutç, Ereb û netewên ku ne faris in û li Îranê jiyan dikin ku ew jî dixwazin tevgerekî xwe ya siyasê çêbikin anku çêdikin lawaz in. Ji ber wê dixwazin di bin sîwaneke hevgirtî di Îranê de, bo avakirina Îraneke demokratîk nenavendî xebat bikin.

**Weku tê dîtin rola herî pêşeng di vê demê de li ser PJAK’ê ye xebatê siyasî û dîplomasî ya ku ji aliyê we ve tê meşandin çi ne, pêşbîniyên we ji dem û geşedanên pêşerojê re çi ne?**

Di nava partiyên Kurdan yên çêbûne de, PJAK di nava her heft partiyên li Rojhilatê Kurdistanê



weke partiya herî gênc, nû û di milê îdeolojîk, siyasî û leşkerî de xwe di hundir civaka Rojhilat de xwebirêxistin kiriye. Û piştî Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî yaku fikre xwe ji PJAK’ê hatiye û di civakê Kurdistanê de deng veda û ev felsefe hêdî hêdî di nava civaka Îranê de belav bû û bandor kir. Bi giştî ez dikarin vê bêjim, lê bê Kurd guhertinên ber bi dermokrasiya Îranê ve mumkin nîne. Kurd pêşengê vê yekê ne û di nava Kurdan de PJAK’ê pêşengtiya vê yekê kiriye.
Do dawiyê de dixwazim viya bîjim; Ev koalisyona partiyên Kurdan yên ku hatiye avakirin, ev ne ji bo demeke kin anku ji bo bersivdana bûyerekî hatiye avakirin. Ev daxwaza gel û partiyên me bû ku bi sala ye xebat ji bo wê hatiye kirin. Ev ê heyanî ku serkeftin misoger dibe û komareke demokratîk tê avakirin wê derdewam bike. Piştî wê ev koalisyon bibe rêveberiya civakê ya siyasî. Me ev koalisyon ku em bibin perçeyek ji vî şerî ava nekiriye, gelê Kurd vî şerî şerê xwe nabîne û derveyî vî şerî disekirin. Ev şer ne şerê gelê Îranê ye jî, ev di navbera du hêzên navnetewî de ye ku dixwazin bibin hegemon. Ji ber wê em berjewendiyên xwe û yên gelê Îranê di vî şerî de nabînin, lê belê bi xwe re metirsiyê tîne û di heman demê de dibe ku bi demê re derfetan jî ava bike. Hêza me wek Koalisyona Partiyên Kurdî û PJAK em dixwazin gelê xwe ji metirsî û xeteriya vî şerî dur bixînin û ger derfet hebe, em bikaribin civaka Îranê demokratîk bikin û hikumeteke nenavendî bê avakirin ku Kurd bikaribin rêveberiya xwe bidest bixin.
Em hewil didin di çarçoveyeke demokratîk, nenavendî û Kurdistaneke xweser de xebatê xwe bidin meşandin. Ev dikare bi awayekî konfedral û nenavendî bi pêş bikeve û lihev bike. Xebatê partiyên me yên Kurdan berê jî hebû û wê heyanî serkeftinê jî berdewam bikin.



Farûk Sakik

## Adîfe Sakik û 8’ê Adarê

Di 8’ê Adara 1985’an de li çiyayê Sason, li gundê Telor şerek qewimî û 8 gerîla şehîd bûn. Di nav wan de jinek jî hebû. Navê wê Adîfe bû.. Bêrîvan bû..Ji bajarê Mûşê ji gundê Zengokê bû..Yekem gerîlaya jin ya wê heremê û xuşka min(FS) bû..
Her sal di 8’ê Adarê roja jinên cîhanê de behsa têkoşîna jinên kurd tê kirin. Disa hersal di têkoşîna jina kurd e behsa şehîdên salê 80’ê yî tê kirin. Navê Adife jî derbas dibe. Tesaduf ya Adîfe jî di 8’ê Adarê de şehîd bûbû.
Adîfe berî ku bibe Berîvan, li gundê xwe wek jinek kurd ya ji rêzê, di nav zeviyên Tutunê de di xebitî. Li ser Adife zilma malbatê û civakê hebû. Tu qedir qiymetek wê tunebû. Adîfe jî wek hemû jinên dinan bi qedera xwe razî bû. Li gundê wê jî wek her deverî, rolên cinsiyetperest yên li jin û mêr hatibûn barkirin hebûn. Ev yek bi xwe re, kodên koletî û serdestiyê dihewandin. Di vê jiyanê de cinsiyetparêzî jinê dixist pozîsyona koleyan. Lê dema ku di sala 1979’an de komek Apocî hatin gundê wê, ew roj heşê Adîfe jî hat serê wê.
Di nav vê komê de Haydar Karasûngûr hebû. Karasûngur di axaftinek xwe de behsa azadiya jinê û ramanên Rêber Apo yên derbar jinê de kiribû. Adîfe ji van axaftinan pirr bi bandor bûbû. Partiyek bi navê PKK’ê hatibû avakirin û di vê partiyê de behsa azadiya jinê hatibû kirin.
Adîfe, biryar da bibe Apocî û ji bo azadiya Kurdistan têbikoşe. Lê diviya di destpêkê jin azad be ku bikaribe ji bo azadiya Kurdistan têbikoşe. Gotinek rêber Apo hebû. Digot, “Jinek azad afirandin ji azadkirina welatekî zahmetir e.” Adîfe li gund di nav jinan de dest bi xebatan kir. Ji koma Apociyan çi agahî girt li nav jinan de belav kir. Navê wê êdî Adîfeya Apocî bû.
Roj hat êdî ji bo wê, ew dem bû. Êrişên dijmin jî destpêkirbûn. Banga rêber Apo jî hebû digot ‘dive jin werin di nav têkoşînê de çalak cîh bigirin û bibin gerîla’. Diviya Adîfe jî, biryarek bida. Di sala 1984’an de ji bo Adîfe salên gerîlatiyê û pêşerojek pirr zelal destpêkir. Li çiyayên Andokê azad û navê wê jî êdî Berîvan bû.
Li ser daxwaza rêber Apo, jinên kurdan wek Adîfe birêxistin dibûn û berê xwe didan nav refên gerîla. Dema xeberên ‘gerîlayên jin’ di nav civakê de belav di bûn, zîhniyeta zilam ya li dijî jinê jî jihevbelav di bû.
Di wan salan de li Kurdistan bingeha azadiya jinê, bi berxwedana Sakîneyan û bi şahadeta Adîfeyan hatibû avêtin. Li ser vê bingehê li rojava şoreş pêkhatibû û jin li eniya pêş cîh girtibûn. Artêşa Adîfeyan-YPJ dema li Kobanê destanek nû ya jinê nivisîn, cîhanê şahidî kir. Jin, li ser vê bingehê, îro li cîhanê ji têkoşîna jinan re pêşengtî dikin. Ew bûn sebeb ku îroj li gelek navendên cîhanê dengê “jin jiyan azadî” bilind dibe.
Dema Adîfe, di 8’ê Adar 1985’an de, di şer de şehîd ket, bi şahadeta xwe peyamek jî dabû jinên kurd. Digot; 8’ê Adarê bi rojek tenê nayê pîroz kirin. Dive jin 364 rojan têbikoşe û roja 365 jî pîroz bike. Vê peyamê jinên kurd girtibûn. Îroj li her deverî jinên kurd 364 rojan bênavber û bêsekin ji bo azadiya xwe û Kurdistan têdikoşin. Û di roja 365’an ango di 8’ê Adarê de dadikevin qadên pîrozbahiyan. Ew ro li qadan dengê jinên azad bilind dibe.



# ‘Rewşenbîr ditirsin ku rêveberiyeke din were û saziyên çandî paşguh bike’

Endamê DHNRKRK'ê Kemal Necim da zanîn ku Desteya Hevbeş pergaleke rêxistinî ya 5 yekîtiyên rewşenbîrî ya Kurd li Rojava ye û got, “Rewşenbîr ditirsin ku rêveberiyeke din were û saziyên çandî yên Kurdî paşguh bike. Eger çand û nasnameya Kurdî neyê qebûlkirin dê riyeke din a pişaftinê vebe.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di 7’ê Adarê de Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriya, Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê, Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûriyê, Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, Yekîtiya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê bi hevbeşî Dîdara Giştî li dar xistin.
Di 18’ê Adarê de jî nûnerên her 5 yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran, li gorî encamên Dîdara Giştî civiyan. Herwiha di encama wê civînê de daxuyaniyeke nivîskî parve kirin. Ji bo rêxistinkirina karê saziyên eleqedar Desteya Hevbeş ya Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Rojavayê Kurdistanê (DHNRKRK) hate damezrandin. Armanca vê desteyê ew e ku bibe kesayeta nûner a nerînên hevbeş di qada çandî ya Kurdî de. Nexasim ji hêla çalakî û boneyên neteweyî û niştimanî di warê çanda Kurdî de ku nasname û ruhê gelê Kurd weke nûnerekî bibandor biparêze. Piştî geşedanên dawî û guhertinên ku Rojava rastî wê rûbirû ma, hem jî îmzekirina peymana 29’ê Çile, êdî pirs di serê rewşenbîr û yekîtiyên rewşenbîr û nivîskaran de ava bû. Pirsa ku ew ê bikaribin di demê pêş de hem jî di çarçoveya peymanê de çawa tevbigerin, hate kirin.
Derbarê kar û xebata desteyê, hem jî erkdariya rewşenbîran li gorî rewşa heyî Desteya Hevbeş a Rewşenbîr û Nivîskarên Kurd li Rojavayê Kurdistanê, Kemal Necim ji rojnameya me re axivî.

**‘Desteya Hevbeş pergaleke rêxistinî ya 5 yekîtiyên rewşenbîrî ye’**

Kemal Necim diyar kir ku Desteya Hevbeş pergaleke rêxistinî ku nûnertiya 5 yekîtiyên rewşenbîrî dike û wiha got: “Dema ku em behsa girîngiya parstina qada rewşenbîrî û parastina nasnameya çandî ya gelê Kurd li Rojava dikin, bi taybet piştî guherînên mezin ên mehên dawiyê û girêdayî wan guherînan îmzekirina peymana 29`ê Adarê, em behsa mijare



ke ji mijara Desteya Hevbeş a Nivîskar û Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê mezintir dikin. Desteya Hevbeş halê hazir tenê pergaleke rêxistinî ye ku bi rêya wê 5 yekîtiyên rewşenbîran tîne ba hev û hewl didin hin karên hevbeş di nav xwe de bi rê ve bibin. Li Rojava ezmûneke kar û çalakiya çandî û wêjeyê ya Kurdî ya nêzî 15 salan heye, di van 15 salan de hewldanên mezin hatin kirin ku bandora pişaftin û qedexeya li ser ziman û çanda Kurdî hatibû ferzkirin were rakirin û derbas kirin. Ev xebat li aliyekî ji hêla dezgehên çandî yên fermî yên girêdayî Rêveberiya Xweser ve, li aliyekî jî ji hêla bi dehan, dezgeh, sazî, yekîtî û komeleyên çandî û wêjeyê û yên zimanê Kurdî ve hatin kirin. Ev saziyê çandî bi awayekî hevbeş qada çalakiya rewşenbîrî û çandî, herwiha qada nivîsandin, dahênan û weşana bi zimanê Kurdî pêş xistin û parastin.”

**‘Rewşenbîr ditirsin ku rêveberiyeke din were û saziyên çandî paşguh bike’**

Necim destnîşan kir ku rewşenbîr ditirsin ku rêveberiyeke nû were û saziyên çandî werin paşguhkirin û wiha domand: “Niha di rewşa heyî de, her çiqas hîna rewş şêlo ye û tevlihev e jî, lê rewşenbîr û qada rewşenbîrî nikarin tirsên xwe veşêrin. Berî her tiştî ji wê yekî ditirsin ku rêvebriyeke ku dê nû were avakirin vê qadê û van saziyan paşguh bike ku niha heme bêje hin nîşanên wê xuyan dikin. Dibe ku rêveberiya nû li dû kar û barên rêvebirinê, aborî, xizmetguzariyê bikeve û guh nede qada çandî. Ji ber tê zanîn ku saziyê sivîl her çiqas çalak bin, bê piştgirî û alîkariya saziyê rêveberiyê dê nikaribin çalakiyeke rewşebîrî ya bi bandor bi rê ve bibin. Li aliyekî din, rewşenbîrên Kurd wê hesabê dikin ku çanda navendî, ango çanda peytextê siya xwe berde ser çanda deverên dûrî navendê û wê têxe bin bandora xwe ya giran. Bi taybet ku pir rewşenbîrên Kurd di encama siyasetên bişaftinê yên rejîma berê de, berê xwe dan nivîsandina bi zimanê Erebî. Eger ku li herêmê Kurdî çalakiyeke rewşebîrî ya Kurdî ya bi hêz neyê avakirin, dê gelek rewşenbîr dîse berê xwe bibin çanda serdest, çanda navendê, ango ziman û çanda Erebî. Li vir dîse rola girîng a yekitiyên rewşenbîran derdikeve holê ku karibin hêza xwe bikin yek û fişarê li rêveberiya nû bikin ku guh bide çalakiya çand û wêjeya bi zimanê Kurdî. Rola rewşenbîran û saziyên rewşenbîrî wê ne tenê ew be ku daxwaza piştgiriyê bikin, lê tê weke hêzeke civakî ya bi bandor têkevin nava qada têkoşîna ji bo bidestxistina mafan.”

**‘Eger çand û nasnameya Kurdî neyê qebûlkirin dê riyeke din a pişaftinê vebe’**

Kemal anî ziman ku eger ziman, çand û nasnameya Kurdî di destûra bingehîn a Sûriyê de neyê çesipandin û naskirin, dê ev yek rêyeke din a siyaset e pişaftinê veke û wiha bi lêv kir: “Pişaftin ne tenê bi qedexeyan pêk tê, lê belê bi hin awayên din pêk tê. Dema ku system yan jî dewlet bi biryarnameyên şêlo nîşan dide ku ew mafê gelê Kurd ê çandî nas dike, lê wê naskirinê nake mafekî destûrî yê gelê Kurd, wê çaxê û rê li ber serdestiya çanda navendê dike, her wiha rê li ber windabûn, neman û pişaftina hemû çandê din ên li vî welatî dike. Lewma rewşa heyî qadeke berferh û demdirêj a têkoşîna ji bo nasname û mafên çandî hatiye vekirin. Di vê têkoşîna mafan de divê rewşenbîr karibin hêza bikin yek û bibin faktoreke bingehîn a guherîn û bidestxistina mafan. Di rewşa heyî de, piştî ezmûna zêdetirî 15 salan, pir diyar bû ku dabeşbûn, belavbûn û parçebûna yekitiyên rewşenbîran bûye sedema lawazî û qelsbûna qada rewşenbîrî, ev lawazî êdî pir diyar û xuya ye .Yekkirina yekitiyên çandî û rewşenbîrî dikare bibe stûnek bingehîn ji bo xurtkirina nasnameya neteweyî û çandî, û bihêzkirina hevgirtina civakî bi rêya çalakiyên hevbeş û hewildanên afirîner û parastina mîrateya çandî. Ev yekbûn dê bibe alîkar ku xebata çandî hîn bêhtir çalak bibe, danûstandina rewşenbîrî kûrtir bibe, û gotareke rewşenbîrî ya yekgirtî pêş bikeve.”

**‘Ji bo parastina nasnameya çandî pêdivî bi xebata yekgirtî heye’**

Endamê DHRNKRK’ê Kemal Necim tekez kir ku Ji bo parastina nasnameya çandî pêdivî bi xebata yekgirtî heye û wiha bi dawî kir: “Li gorî van geşedanên dawiyê, dê di demên pêş de roleke pir girîng bikeve ser milê rewşenbîran. Ji bo parastina nasnameya çandî ya gelê Kurd li Sûriyê pêdivî bi hewldanên yekgirtî heye, her wiha pêdivî bi gotareke rewşenbîrî ya resen û bi hêz heye ku karibe bi çandên civakên cuda yên Sûriyê re hemahengî û danûstandineke şaristanî pêk bîne. Ev hêza rewşenbîran a yekgirtî bê guman dê Desteya Hevbeş be, lê li şûna wê niha ji her demê bêhtir pêdiviya nivîskar û rewşenbîrên Kurd bi sazîbûneke yekgirtî, bi hêz û bi bandor heye. Lewma dem hatiye ku yekitiyên rewşenbîran bi wêrekî û vîn û biryar tevbigerin û bi rêya konreyekê yan civîneke berferh yekitiyeke tenê ya hemû nivîskar û rewşenbîran ava bikin.”



# Projeyên dabînkirina avê li bajarê Qamişlo

**Rêvberê Daîreya Avê ya bajarê Qamişlo Mehmûd Mehmûd destnîşan kir ku bi armanca xurtkirina çavkaniyên avê projeyên berfireh yên kolandina bîran dabûn destpêkirin û got, "Tevî zehmetiyan daîre hewil dide ku planên xwe yên xizmetguzarî ji bo dabînkirina pêdiviyên gel, bi cih bîne."**

Lîloz Hisên/Qamişlo





Bajarê Qamişlo di demên dawî de bi pirsgirêkên xizmetguzariyê yên zêde re rû bi rû ma bû, bi taybetî aloziya elektrîkê ji ber qutbûna elektrîkê a ku ji Bendava Firatê çêbûye. Vê yekê rasterast bandor li ser sektorên girîng, bi taybetî sektora avê kiriye. Di bin van şert û mercên awarte de, Daîreya Avê xwe bi rastiyek dijwar re rû bi rû dît ku bersivek bilez û tedbîrên alternatîf yên hewce dike, bigre da ku dabînkirina domdar a avê ji gel re misoger bike.

Ligel van zehmetiyan, daîreyê rêze tedbîrên awarte û xebatên lênêrînê yên dijwar li ser stasyon û bîran da destpêkirin, ku xwe dispêre jeneratoran da ku bi berdewamî di nava xebitandinê de be û ji bo aramiya pêvajoya pompekirinê bidomîne. Di heman demê de daîreyê li ser pêşxistina projeyên stratejîk ên nû xebat da meşandin, bi armanca zêdekirina çavkaniyên avê û karîgeriya torê baş bikin, ji bo ku bi vî rengî domdariya xizmetê misoger bikin û hewcedariyên şêniyên li bajar û navendên koçberiyê bicîh bînin.

Derbarê vê mijarê rêveberiya Dayîreya Avê Mehmûd Mehmûd axivî.

### Sererastkirina toreyên avê

Rêveberiya Dayîreya Avê Mehmûd Mehmûd destnîşan kir ku ji ber bûyerên dawî ku herêm tê de derbas bû zirar gihaşt sektora elktrîkê û wiha berdewam kir: "Di encamê de elktrîk li ser herêmê hat qutkirin ji ber ku ji Bendava Firatê hat qutkirin, vê yekê hişt ku rastiyeke nû ya xebitandinê li ser daîreya avê çêbike, bi rawestandina elktrîkê, bi awayekî rastersat daîreyê xwe sipart li ser jernetoran ji bo xebitandina stasyon û bîran."

Mehmûd Mehmûd destnîşan kir ku 3'ê stasyonên sereke ku bi jeneratorên elektrîkê tên xebitandin hene û wiha anî ziman: "Sê stasyonên serke yên pompekirinê yên bi jeneratoran ve tên xebitandin hene, ji bilî 14 bîrên li aliyê taxên rojhilat ku bi deh jeneratoran ve têne xebitandin. Ji rojên destpêkê ve, tîmên teknîkî dest bi xebata lênêrînê ya berfireh kirin da ku amadebûna van jeneratoran û şiyana wan a li hember zexta xebitandinê ya domdar piştrast bikin. Daîreyê bi awayekî serkeftî pênc jeneratorên ku bîrên aliyê rojhilat dabîn dikirin, yek ji wan ji bo stasyona Ceqceq û yek jî ji bo stasyona Hilêliyê sererast kirin, bi vî awayî hejmara giştî ya jeneratorên ku hatin sererastkirin gihaşt heftan. Vê yekê hişt ku aramî di pêvajoya pompekirinê û berdewamiya xizmetê de çêbibe.



### Sererastkirina pompeyên binavî

Wekî beşek ji başkirina amadebûna stasyonan, Daîreya Avê girîngiyeke taybetî da sererastkirina pompeyên binavî, ku stûna sereke ya pêvajoya derxistina avê ji bîran pêk tînin, di vê çarçoveyê de Mehmûd Mehmûd wiha anî ziman: "Tîmên lênêrînê di dema borî de karîbûn heşt pompeyên binavî sererast bikin, şeş ji wan li stasyona Hilêliyê û du li stasyona Ceqceq. Herwiha rêxistina Xaça Sor çar pompeyên binavî yên din li stasyona Hilêliyê guhert, wekî gavek ji bo piştgiriya hewildanên daîreya avê di heman demê de bû alîkar di zêdekirina karîgeriya pompkirinê de.

Girêdayî girûpên horizontal, neh girûp hatin sererastkirin, heft jê li stasyona Hilêliyê, yek li stasyona Iwêca ye û ya din li stasyona Ceqeq e. Ev kar û xebat bû alîkar di başkirina aramiya toreyê û kêmkirina qutbûyîna ji nişka ve yên dibe ku bandorê li gîhaştina avê ji bo taxên niştecihbûnê bikin.

Wekî beşek ji plana xwe ya lênêrîna rotîn û bersiva giliyan, daîreyê hewil da ku kêmasiyên di torên avê yên malan û yên sereke de çareser bike. Nêzîkî 32 xetên avê yên malan hatine sererastkirin, ji bilî lênêrîna 25 xetên sereke û şaxî. Wekî din 27 xetên şikestî an jî yên nehatine bikaranîn hatin rakirin, ji ber ku daxwaz an jî hewcedariyek rastîn ji bo berdewamiya xebitandina wan tune bû, ev yek bû alîkar di kêmkirina xerckirin û baştirkirina belavkirina avê."

### Rojane av li 80'ê navendên koçberiyê tê belavkirin

Mehmûd Mehmûd wiha berdewam kir: "Tîmên daîreyê, bi hevahengiya Daîreyên Jîngeh û Agirkujiyê û çar rêxistinên mirovî, erkê belavkirina avê bi rêya tankeran girtin ser xwe. 135 stargeh hene û nêzîkî 80 ji wan rojane bi rêkûpêk av werdigirin. Ev yek li gorî planeke belavkirina rojane têne kirin, da ku gihaştina avê ya dadperwer misoger bikin, bi berçavgirtina hejmara koçberan li her stargehekê, ji bo misogerkirina dabînkirina pêdiviyên bingehîn ên gel."

Ev tedbîr wekî beşek ji ji nû ve rêxistinkirina tora avê û bilindkirina karîgeriya wê tên, bi taybet di çarçoveya zexta zêde ya ji ber hejmara bilind a sûdmendan li hin taxan. Bi pêla koçberiya ku di dema dawî de çêbû, bi hezaran şêniyan berê xwe dan kantona Cizîrê, vê yekê hişt ku pêwistyeke bi lez ji bo peydakirina avê ji bo navendên koçberiyê çêbibe.

### Projeyên kolandina bîran

Wekî beşek ji planên xwe yên stratejîk ji bo 2025 û 2026'an, Daîreya Avê projeyek kolandina bîrên berfireh da destpêkirin, bi armanca zêdekirina çavkaniyên avê û kêmkirina xwesipartina li ser torên ku ji ber xirabûn an qutbûna elektrîkê bandor bûne.

Mehmûd Mehmûd wiha anî ziman: "12 bîr hatine kolandin û bi temamî bi dawî bûne. Niha pompeyên binavî têne sazkirin da ku amadekariya aktîvkirina wan di rojên pêş de bikin. Şeş bîr li aliyê rojhilat hîn jî di bin çavdêriyê de ne, ji bilî du bîrên li stasyona Ceqceq, ku yek ji wan temam bûye û xebat ji bo temamkirina ya din jî berdewam dike."

Tê payîn ku ev bîrên nû hevsengiya avê ya bajêr baştir dike û zexta li ser bîrên heyî, bi taybet di demên daxwaza zêde de sivik bikin.

### Projeya jeneratorên yedek

Mehmûd Mehmûd diyar kir ku di nava pilanên sala 2026'an de, Daîreya Avê li ser projeya dabînkirina şeş jeneratorên elktrîkê ji bo stasyona Hilêliyê kar dike, da ku bibe wekî yedekek istratîjîk dema qûtbûna elktrîkê û wiha domand: "Heya niha ev jenerator ne ketine dest me de, lê ew di nava pilanên vê salê de ne, armanca wê berdewamiya pomekirinê di rewşên awarte de ye herwiha kêmkirina demên qutbûyînê. Yek ji projeyên herî girîng ên ku niha di meriyetê de ne, projeya avakirina cihekî ku av lê kom dibe (Mûcemi) li stasyona Hilêliyê ye, ku kapasîteya wê 52 metrekup e. Girîngiya vê projeyê ew e ku ava bîran di nav rêzekê de berî ku were veguhestin ji bo depoyên sereke were berhevkirin."

Rêveberiya Dayîreya Avê Mehmûd Mehmûd wiha bidawî kir: "Mekanîzma xebatê li ser wê yekê ye ku xetên berhevkirina bîran pêşî ber bi cihê kombûna avê ve werin veguhestin, piştre re jî avê ji wê ber bi sê tankên li stasyona Hilêliyê ve were belavkirin. Sûda sereke ya vê ciha kombûna avê ew e ku bêyî hewce bike ku av bi tevahî were qutkirin, karên lênêrînê werin kirin, ji ber ku beşek ji torê dikare were veqetandin û pompekirin dikare bi rêya cihê kombûyîna avê were berdewam kirin. Heta niha nêzîkî ji sedî 30 proje temam bûye û xebat bi awayekî lez berdewam dike da ku di zûtirîn dem de temam bibe, ji ber bandora wê ya rasterast li ser aramiya xizmetê û rêvebirineke çêtir.



# Li hemberî her rastiyekê Şerê Taybet tê meşandin

**Şerê li dijî gelê Kurd ne tenê bi çekan tê meşandin, lê bi rêbazên ne eşkere tê birêvebirin ku ew jî Şerê Taybet e. Di vî şerî de li şûna şerê leşkerî, propaganda, şerê agahdariyê, zexta psikolojîk û parçekirina civakê dibin amûrên bingehîn. Lê hevgirtina civakî û netewî dikare bibe astengiyek li dijî bandora Şerê Taybet.**

Ronahî Sadûn/Qamişlo

Piştî dabeşkirina Rojhilata Navîn, Kurd di nav çend dewletan de hatin parçekirin. Di encama vê dabeşkirinê de pirsgirêka Kurdî di nav siyaseta her dewletê de bû mijarek girîng. Li hin welatan, rêbazên kontrol û siyaseta asîmîlasyonê bi awayekî berfireh hatin bikaranîn. Di vê çarçoveyê de, li Tirkî, Îran, Iraq û Sûriyê rêbazên cuda yên siyasî û ewlehiyê li hember civak û tevgera Kurdî hatin pêkanîn. Rêbazê herî zêde xwe da pêş jî 'Şerê Taybet' e.

### Têgîna Şerê Taybet

Di nav teoriya siyasî û leşkerî de, Şerê Taybet tê wateya şerekî ku li dijî civakê bi awayekî ne eşkere tê meşandin. Armanca wê ev e ku moral, hevgirtin û nasnameya civakê lawazbikin. Şerê Taybet yek ji stratejiyên siyasî û leşkerî ye ku bi taybetî di serdema nû de ji hêla dewletan ve tê bikaranîn, da ku civakan an tevgerên siyasî bêyî şerê rast û eşkere têk bibin. Ev şer ne tenê bi çekan tê meşandin, bi rêbazên psikolojîk, propagandayê, aborî, medyayî û civakî jî tê pêkanîn.

### Şerê Taybet ji qada leşkerî derbasî qada civakî hat kirin

Di nav guhertinên siyasî û leşkerî yên herêmê de, mijara "Şerê Taybet" di salên dawî de zêdetir tê gotin û nîqaşkirin. Bi taybetî di çarçoveya pirsgirêka Kurdî de ku şerê li dijî kurdan ne tenê bi çekan tê meşandin, lê bi rêbazên ne eşkere jî tê birêvebirin. Şerê Taybet, stratejiyeke ku armanca wê qelskirina civakê ye. Di vê şerî de çek û leşker ne her dem amûrên sereke ne. Li şûna wan, propaganda, şerê agahdariyê, zexta psikolojîk û parçekirina civakê dibin amûrên bingehîn. Herwiha ev şer ji qada leşkerî derdikeve û dikeve nav jiyana rojane ya civakê.

### Hevgirtina civakî û netewî astengiyek li dijî bandora Şerê Taybet

Di dîroka nêzîk de, Kurd di gelek deverên Rojhilata Navîn de bi şert û mercên dijwar rûbirû bûne. Di vê çarçoveyê de, polîtîkayên ku li dijî nasnameya Kurdî, zimanê Kurdî an jî rêxistinên civakî têne bikaranîn, dikarin wekî beşek ji stratejiya Şerê Taybet bêne dîtin. Armanca van rêbazan ew e ku civaka Kurdî ji hêla siyasî, civakî û piskolojîk ve bê qelskirin. Rola medyayê di vê şerî de pir girîng e. Di serdema medyayê nû de, agahdarî dikare zû belav bibe, lê di heman demê de agahdariya şaş an propaganda jî bi heman awayî zû digihîje civakê. Ev dibe sedema tevliheviyê û lawazbûna baweriya civakî. Lê çareseriya herî girîng hişmendiya civakî ye. Civakek ku agahdar be, dikare propaganda û şerê piskolojîk baştir nas bike. Herwiha hevgirtina civakî û netewî jî dikare bibe astengiyek li dijî bandora Şerê Taybet.



### Bi rêya Şerê Taybet rêxistinên Kurd tên hedefgirtin

Şerê Taybet di nav de çend alî hene: Propaganda, şerê psîkolojîk, guhertina demografîk, kontrola medyayê, zexta siyasî û rêbazên civakî ku armancê wan qelskirina hişmendiya netewî ye. Yek ji bandorên herî mezin ên Şerê Taybet li ser civaka Kurdî qelskirina rêxistin û têkoşîna siyasî bû ku xebat hatin kirin, da ku di nav rêxistinên Kurdî de nakokî çêbibin.

### Bandora Şerê Taybet di hin qadan de

Ev şer bandorên xwe di warên siyasî, civakî, çandî û ragihandinî de nîşan dide.

### Bandora siyasî

Yek ji qada ku Şerê Taybet herî zêde bandorê li ser dike qada siyasî ye. Di gelek herêmên ku Kurd lê dijîn de, partî, rêxistin û kesayetiyên ku daxwaza mafên Kurdî dikin, pir caran bi zexta siyasî re rû bi rû dimînin. Girtin, qedexeyên siyasî an jî sînorên li ser çalakiyên siyasî dikarin beşdarîya civakê di siyaseta fermî de kêm bikin.Ev rewş di hin deman de dibe sedem ku civaka Kurdî di navbera heviya guhertinê û hestên bêhêviyê de bimîne. Di heman demê de, ew jî dibe sedem ku rêbazên din ên têkoşînê û berxwedanê di civakê de were guftûgokirin.

### Bandora civakî

Şerê taybet di nav civaka Kurd de dikare bandorên civakî jî çêbike. Yek ji armancên girîng ên vî şerî ew e ku hevgirtina civakê qels bike. Ev carinan bi propaganda û agahdariya şaş tê kirin.

Di encamê de, nebawerî û guman di nav kesan de zêde dibin û civak di navbera fikr û rêbazên cûrbecûr de, parçe bibe. Lê li hember vê rewşê jî gelek hewl didin ku bi rêxistina civakî, çalakiyên sivîl û hevgirtina civakê vê kêm bikin.

### Bandora çandî û nasnameyî

Şerê Taybet di warê çand û nasnameyê de jî xwedî bandor e. Di dîroka nêzîk de, gelek siyasetan hewl dan ku ziman, çand û nasnameya Kurdî kêmreng bikin, an jî di bin sînorên fermî de bihêlin. Sînorên li ser perwerdehiya bi zimanê Kurdî, kêmkirina cihê zimanê Kurdî di ragihandinê de an jî zext li ser çalakiyên çandî dikarin wekî aliyên vê siyasetê werin dîtin. Lê di heman demê de, di salên dawî de tê dîtin ku civaka Kurd bi awayek berfireh li ser parastina nasnameya xwe dixebite. Pirtûk, muzîk, huner, medyayên nû û çalakiyên çandî bûne amûrên girîng ji bo parastina ziman û çanda Kurdî.

### Bandora aborî

Qada din a ku bandora Şerê Yaybet tê de tê dîtin aborî ye. Li gelek herêman, şertên ewlehiyê û pevçûnên siyasî dikarin pêşketina aborî rawestînin. Koçberiya hundirî û kêmbûna derfetên karê, li şertên jiyanê yên gel bandor dikin. Ev jî carinan dibe sedem ku kesên ciwan ji herêmên xwe koç bibin an jî di şertên dijwar de bijîn.

### Şerê ragihandinê

Di serdema nû de, yek ji aliyên herî girîng yên Şerê Taybet, şerê ragihandinê ye. Medya, torên civakî û platformên dîjîtal bûne qada ku raya giştî ji aliyê vê we tê rêvebirin. Belavkirina agahdariya şaş, propaganda, dikare bandorê li ser têgihiştina civakê bike. Li hemberî vê yekê medyayên Kurdî û çalakiyên ragihandinê hewl didin ku nêrîna xwe ya li ser bûyeran bi awayekî rast bighînin raya giştî.

### Hin mînakên Şerê Taybet ku em di roja îro de dibînin, ev in:

- Propaganda û şerê agahiyê ku di gelek welatan de medyaya dewletan an jî rêxistinên nêzî wan, têkildariya Kurdan bi "terorîzmê" ve girêdide, tevgerên siyasî yên Kurdan wekî xeter nîşan dide û agahiyên derew belav dike. Armanca vê yekê ew e ku desteka civakî ji bo mafên kurdan kêm bike.
- Dabeşkirina navbera pêkhateyan de yek ji rêbazên herî girîng ev e ku partî û rêxistinên Kurdî li dij hev werin bikar bînin, nakokîyên herêmî an partî zêde bikin û mirov di nav civakê de ji hev bawer nekin. Ji ber dema ku Kurd bi hev re dijmin dibin, dijmin hêza xwe zêde dibînin.
- Şerê çandî û asîmîlasyon ku li gelek deveran zimanê Kurdî tê astengkirin, perwerdehiya bi Kurdî kêm tê dayîn, çand û dîroka Kurdî tê paşguhkirin. Armanca vê yekê ew e ku nifşên nû ji nasnameya xwe dûr bixin.
- Şerê aborî ku li herêmên Kurdan pir caran bi kêmbûna kar, kêmbûna xizmetan an jî koçberiya bi zorê rûbirû tên. Ev jî dibe sedem ku civak belengaz bibe û hêza civakî kêm bibe.
- Şerê derûnî (pîskolojîk), ev jî rêbazek e ku tirs di civakê de belav bikin, mirov bê hêvî bikin, baweriya gel bi serketinê kêm bikin.

### Şerê Taybet dide diyarkirin ku şer ne tenê çek e

Şerê Taybet tê wateya ku şer tenê bi çekan nayê kirin. Ji ber vê yekê parastina xwe jî tenê bi hêzên leşkerî nabe, divê civak bi gelemperî hişyar be.

### Hin rêbazên bingehîn ku Kurd dikarin xwe bi wan biparêzin, ev in:

- Hişyariya siyasî û civakî: Civak divê zanibe ka Şerê Taybet çawa dixebite. Mirov propaganda derew an planên ku civakê perçe dikin nas bike, wê demê bandora vî şerî kêm dibe. Di heman demê de hişyariya civakî yek ji çekên herî girîng e.

- Parastina yekîtiya neteweyî: Yek ji armancên sereke yên Şerê Taybet dabeşkirina Kurdan e. Ji ber vê yekê, divê rêxistin, partî û kesayetî bi hev re bixebitin û nakokî ne bi dijminan re, lê di navbera Kurdan de were çareserkirin.

- Hêzkirina çand û ziman:
Şerê Taybet pir caran li ser ziman, çand û nasname tê kirin. Lewra heke Kurd zimanê xwe fêr bibin û bi kar bînin, çanda xwe biparêzin, dîroka xwe bizanin, wê demê şerê asîmîlasyonê kêm bandor dike.

- Medyaya hişyar: Propaganda bi rêya medyayê pir tê bikaranîn. Ji ber vê yekê, mirov divê her agahiyê bê lêkolîn qebûl neke û piştgiriya medyaya ku rastiyê derdixe, bike.

- Rêxistina civakê: Civakê ku xwe rêxistin dike (di nav komîn û rêxistinên civakî de) li hember Şerê Taybet zêdetir parastî ye, ji ber mirov bi hev re têkildar dibin û bi hev re bersiv didin.

- Perwerdehiya nifşên nû: Nifşên nû heke,
dîrok, nasname û siyaseta herêmê baş bizanin, wê demê bi hêsanî nayên xapandin. Herwiha parastina li hember Şerê Taybet bi hişyariyê, yekîtiyê, çand, medyaya rast û rêxistina civakî pêk tê.

### Encam

Şerê Taybet di pirsgirêka Kurdî de ne tenê wek şerê leşkerî, lê wek stratejiyek berfireh ku bandorên wê li ser civaka Kurdî di gelek waran de xuya dibin. Her çend ev rêbaz gelek zext û guhertinên kûr çêkiribe jî, di heman demê de di nav civaka Kurdî de hişmendiya nasnameyê, çand û mafên netewî jî zêde kir. Di encamê de, pirsgirêka Kurdî û şerê taybet mijarek piralî û giran e. Lê tiştek zelal e di serdema nû de şer tenê li meydanên leşkerî nayê kirin, ew di ziman, agahdarî, medyayê û hişmendiya civakê de jî tê meşandin. Ji ber vê yekê, hişmendî hevgirtin û agahdariya rast dikare bibe yek ji bingehên girîng ji bo parastin û berxwedana civakê.

# ‘Îran ber bi têkçûnê ve diçe’

Rojnamevan Kakşar Oremar da zanîn ku Trump dixwaze cîhanê bixe bin serweriya xwe û got, “Armancgirtina jêrînxaneya leşkerî li deverên Rojhilatê Kurdistanê nameyeke ku dibêje bila gelê Kurd li dijî rûxandina rêjîma Îranê amade bike. Îran lawaz bûye û ber bi têkçûnê ve diçe.”

**Reşo Mihemed**



Şerê Amerîka û Israîlê li ser Îranê rojeveke girîng a cîhanê ye, beşek ji vê rojevê jî rewşa gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê ye, derbarê heman mijarê rojnamevan Kakşar Oremar bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Armanca şerê Israyil û Amrîkyayê li ser Îranê çi ye?**

Armanca şerê Israîl û Amerîkayê yê li ser Îranê gelek aliyên xwe hene. Hem rûbera wê ya cîhanî heye di mijara enerjî û biloka heyî ya Çîn-Îran-Rûsiya, hem jî di aliyê herêmî de mijara hilberîna Uranyomê û mûşekên Balistî yên ku dûrahiya avêtina wan 2 hezar û 500 km e, di heman demê de destwerdana Îran li herêmê wekî Îraq, Lubnan û Sûriye, hem jî bihêzkirina hêzên alîgir ên Hemas, Huzbullah û Heşd Elşeibî. Ya din Îranê siyaseteke baş neda meşadin têkildarî wan bangên ku Amerîkayê ji bo çareserkirina pirsgirêkan li ser maseyê. Îranê nikarîbû bi rêbazên cuda xwe ji vî şerî xelas bike, kesê ku fitwe û biryar didan Xaminî bû, ew niha ji holê hate rakirin. Niha jî Amerîka û Israîl li benda wê yekê ne ku yê cihê Xaminî bigire, siyaseteke nerm li hemberî herêmê, Amerîka û Israîlê bimeşîne. Armanca din a bingehîn ku Trump dixwaze tevahiya dunyayê bixe bin serweriya xwe. Amerîka şerê aborî di danîna budceyan li ser gelek kelûpelan daye destpêkirin. Li hêla din Amerîka dixwaze Israîlê weke hêza yekem di Rojhilata Navîn de li dijî biloka ku pêşengtiya Islama Şîa dike, bide pêşandan. Em dizanin Amerîka yekemîn hêza serwer ku petrolê hildberîne Amerîka ye, çendîn nefta cîhanê di destê Amerîka de be jî, lê pêwîstiya wê bi hêza enerjiyê heye. Îran serwer e li ser Kendava Faris, zêdeyî 20 riyên aborî di wê kendavê re derbas dibin, Amerîka dixwaze destê xwe deyne ser wê kendavê. Li aliyê din Israîl dixwaze jêrxaneya Îranê ya leşkerî ji holê rake. Heman sînaryo ya ku Israîlê li Sûriyê pêkanî dema ku rêjîma Baas têkçû, dixwaze wiha li Îranê jî pêkbîne.

**Kurd di vi şerî de li ku cihê xwe digrin û pêwîst e bi çi awayî rewşa heyî bixwînin?**

Li nava komên opozisyonê û aliyên siyasî yên li Îranê, aliyê herî jeopolîtîk yê herî girîng ji bo rûxandina rêjîma Îranê gelê Kurd e. Di warê serjimariyê de Kurd piştî nifûsa Farisan tên, di heman demê de Rojhilatê Kurdistanê parçeya duyemîn e piştî Bakurê Kurdistanê tê hesbandin. Li Rojhilat 7 partiyên siyasî yên Kurdî hene, 5 partî ji wan berî ku şer rûbide, hevgirtineke xwe ava kirin, paşê partiya 6’an tevlî wê yekbûnê bû. Çi mela û xwediyên şaşikan bin an şah xwediyên tacan bin, ew dijî Kurdan yekhelwest in, wan gef li gelê Kurd kirin, ji ber vê yekê jî yekrêziya wan partiyan hat ragihandin. Di heman demê de ev yekîtî peyameke girîng ji bo Amrîka û Israîlê bû. Ji nava hêzên opozisyonê ku daxwaza otonomiya Kurdî dike, Partiya Mucahidînê Xelq e, ew û Seltene Telb dijî dewleta Îran a navendî ne û her du jî li dijî hev in, eger di dema pêş de rêjîm weşiya dibe ku nakokî di navbera her du aliyan de derkevin holê. Di dema heyî de hesasiyetên mezin li pêşiya Kurdan e, hem jî derfetên mezin jî li ber destê gelê Kurd li Îranê ye. Divê Kurd van derfetan bi durstî bi kar bînin û nebin leşkerê ser erdê li pêşiya Amerîka. Xebera dawî ew e ku Trump gotiye ezmanê Rojhilat biparêzin û em ê nehêlin dewleta Îran û yên din firînê tê de çêbikin, eger ev yek pêkwere wê Pêşmerge bi piştevaniya gel leşkerên Îranê têkbibin û rêjîmê birûxînin. Di vê dema dawiyê de bargehên leşkerî yên Îranê ku li herêmên Kurdî ne, bûn armanca êrişên Amerîka û Israîl. Ev nameyeke girîng e ku dibêje Kurdan xwe amade bikin, erka mezin di warê têkbirina rêjîma Îranê de li ser milê we ye.

**-Sînaryoyên li pêşiya Îranê çi ne û wê rewşa heyî ber bi ku ve biçe?**

Îran weke hikumet bi çi qîmetê be dixwaze hebûna xwe biparêze, lê di meydana leşkerî û siyasî dê çiqasî Amerîka û Israîl derfetê bidin Îran ne diyar e, em dibînin roj bi roj ew derfet ji bo Îranê lawaztir dibe. Bi demê re zexîreya çekan kêmtir dibe, ev şer nikare bidome ji ber rêgirtina riya enerjiyê, domandina şer jî xwesteka Israîlê ye. Niha du tişt di destê Îranê de ne, yek jê xetên bazirganiyê ya Kendava Hurmiz e, eger ew were girtin wê rewş ber bi xerabiyê ve biçe, ew ê Amerîka û Çîn jî zererê bibîne. Ya ku ew ê sûdê ji girtina Kendava Hurmiz bigire Rûsya ye. Tişta din ew e ku şensê Îranê di qada diplomatîk de heye, ew mafdar e bi riya VITO, Çîn û Rûsya ku UN li hemberî Amerîka û Israîlê bi kar bînin, lê em dibînin ku rola UN tuneye ji ber ku heta niha nikarîbû agirbestekê ragihîne. Niha rewşa Îranê gelekî lawaz e, dibe ku bi vê lawaziya xwe berdewam bike, eger dewletek veger wê dewleteke qels vegere û eger venegere, derfetek ji bo tevgera siyasî ya Kurd, bi taybet a Rojhilat û bi giştî ya Kurdistanê. Îran ber bi têkçûnê ve diçe, di warê civakî de fermiyeta wê de sifr e, di nava gel de dijberê hikumeta Îran gelek in, tevî ku niha şer e, welat wêran dibe, lê gel kêfxweş e ku wê ev rêjîm wê têkbiçe, ji ber ku civak di her warî de westiyaye. Di siberojê de dibe ku welatên derdorê destwerdanê di mijara Îranê de bike, bi taybet dewleta Tirk, lê eger Bakurê Kurdistanê li ser piyan be, ew ê destwerdana Tirkiyê kêmhêz be. Sê dîktator çûn yek ma, em ê binerin ew ê bi riya tevgera demokratîk ya Bakurê Kurdistanê dîktatorê çaran çawa biçe. Divê ji niha ve tevger projeya xwe û isteratîjiya xwe, hem jî kar û xebata ku wê were kirin li Bakurê Kurdistanê diyar bike.

**Dibe ku pirsgirêk di navbera Kurd û Azeriyan de li herêmên Urmiye, Nexed, Xoy û hwd… derkevin gelo rêyên çareseriyê ji bo dûrxistina van pirsgirêkan çi ye?**

Opizsyona Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê xwedî tecrubeyeke serhildanan a kevnar e û heza Kurdan ji dîrokê û partiyên siyasî hiştiye asta rewşenbîriya civakê bilindtir bibe berevajî ya Azeriyan. Xala din Azerî weke Şîe hevparên dewleta navendî ne, di nava Azeriya de, mijara netewî piştî mijara olî tê, Sefewiyan li Azerbîcanê mezhebê Şîe kirine mezhebê dewletê ji bo parastina sînorê dewleta Islamî, hewiha gelek ji wan bûn hevkarên dewleta navendî ya Îran. Di nava Azeriyan de partiyên siyasî tunene, eger hebin jî navê li ser kaxezê ne, gelekî bêhêz in û di nava xelkê Azerbîcanê de bê bêrol in, lê belê ew partî û kenalên wan di bin siyaseta dewleta Tirk de tevdigerin û dijîtiya gelê Kurd dikin, di heman demê de hin partiyên Azeriyan û kenalên wan ên ku dijî Kurdan dikin hene. Navenda nasyolîza Kurdî û serhildanên dîroka Rojhilata Kurdistanê Urmiyê ye, ji serhildana Kela Dimdim bigire heya ya Şêx Ubeydullahê Nehrî, Simkoyê Şikak, ya Qazî Muhemed û gelek serhildanên biçûk li wê herêmê çêbûne. Kurd di mêjûyê de ji Azeriyan bêtir xwedîtiyê li serhildan û pêşengên xwe dikin, di hemwextiya avabûna Komara Kurdistanê, hikumeta Azerbîcanê jî çêbû, tevî ku çend mehan piştî Komara Kurdistanê domand, Azerî çi caran hikumeta Azerî bi bîr nayînin û heta Cafer Pîşewerî wekî sîxurê Rûsyayê dibînin, lê Kurd piştî 80 salî ji Komara Mihabadê bi bîr tînin, di heman demê de Kurd hemû pêşengên xwe yên wekî Simkoyê Şikak, Dektor Qasimlo û hwd… rêberên pîroz bi nav dikin. Dewleta navendî ya Îranê hezkera şer bû, bi taybet li Nexedê şer derxistiye, dema ku cenayet li Nexedê dijî Kurdan cînayet pêkhat. Lê ema dîrok wê dubare nebe, Azerî wê nikarbin bi piştevaniya Tirkan di siberojê de êrişî Kurdan bikin, dibe ku nakokiyên biçûk û şer derkevin, lê bernameyên Kurdan ji bo diyalogê û çareserkirina pirsgirêkan amade ne. Di nava Azeriyan de jî ev yek belavbûye ku Azerî dibêjin em pirsgirêkên xwe bi awayekî demokratîk çareser bikin ne bi şer.



## Kurd kilîta guhertina tevahî Îranê ne



**Dilyar Cizîrî**

Bi salane li herêma Rojhilata Navîn planeke guhertina bingehîn tê bi rê ve birin. Ev bi şerê kendavê û ketina rêjîma Sedam Huseyin a Kiwêtê re destpê kir. Îro bi êrişa Amerîka-Îsraîlê ya li dijî rêjîma Îranê berdewam dike. Di vê dema navborî de li Sûriyê, Îraq, Lubnan, Yemen, û hin welatên din ên Rojhilata Navîn guhertinên mezin çêdibin. Rêjîmên Baas li Sûriyê û Îraqê, rêjîma Lîbiya û ya Misr û her wekî din hatin ruxandin. Hemû guhertin bi plan pêk hatiye. Êrişa niha li dijî Îranê jî berdewama planê ye. Tişta bi serê van rêjîmên navborî hat jî wan heta kêliyên dawî jî ne dikarîn guhertinan li ser erdê pêk bînin. Nerîna xwe ya bi gelê xwe re ne dan guhertin.
Li Îranê jî tevî ev 13 roj in Amerîka û Îsraîlê bi awayekî berifreh êrişên xwe li dijî rêjîma Îranê didomîne. Elî Hamînaî jî di nav de gelek berpirs û lêderên Îranê bi derbeyên ezmanî hatine kuştin. Lê hîn jî rêjîma Îranê di siyastên xwe yên hindirîn de bi israr in. Rêjîma Beşara El Esed tevî bi salan şer li serasnerî welat rû da û bi sedhezaran kes hatin kuştin, bi milyonan koçber bûn û gelek hêzên derve destwerdan di xaka Sûriyê de kirin, di siyaseta xwe ya hundirîn de tu guhertin çênekir.
Rêjîma Îranê di vê dema rastî êrişan tê, çekên xwe li derdora xwe belav dike. Ji welatên Kendavê bigre û heta herêma Fedaral a Başûrê Kurdistanê bombebaran û topbaran dike. Di heman demê de li şûna bi gelê kurd û pêkhateyên din ên Îranê re bicivin û mijarên navxweyî yên Îranê çareser bike. Bersiva gelê Îranê bi topbaran, zordarî û darvekirinê dide. Êrişa wan li dijî baregehên Partî û tevgerên Kurd beşekî wê zihniyetê ye. Rêjîma Îran hîn ne gihiştiye wê baweriyê ku tekane riya xilasiya welat ji wêran û tundiyê demokrasî û çareseriya doza civakê ye.
Gelê Îranê beriya niha jî li dijî rêjîma Îranê bi diruşmeya “jin jiyane azadî” li dijî rêjîma îslamî ya Îranê serî rakirin û gelek xupêşandan lidarxistin. Niha jî her çendî Amerîka û Îsraîlê bi balafir û fûzayan bargeh, navend û çavkaniya aboriya rêjîmê bombebaran dike, bêyî eniyên hindir hilweşîna rêjîma Îranê ne mumkine. Di hindirê Îranê de hêza herî rêxistinkirî ya Rojhilatê Kurdistanê ye. Bi wate ji bo hilweşîna rêjîma Îranê rêxistinên Kurdistanî yên hevgirtina xwe ragihandin, tekane riya guhertinê ye.
Ji ber wê jî me dît çend roj berê di medya Amerîka û hin welatên Ewropa de mijara gelê kurd pir xistin rojevê. Lê ji hevgirtina rêxistinên siyasî ya Rojhilatê Kurdistanê tê xwestin di hindirê Rojhilat de zemîna guhertin û veguhertinan amade bike. Tişta heta niha diyar dibe jî wiha ye.
Ev baldarî û rêxistinkirina civakî û di heman demê de pêşxistina dîplomasiya xwe ya bi derve re pêşxistin di vê demê de pir girînge. Guhertina li Rojhilat û pêşketinên li wir dê yekser bandora xwe li ser Rojava, Başûr û Bakurê Kurdistanê jî bike. Ji ber wê jî divê Kongereya Netewî ya Kurdistanê di zûtirîn dem de pêk were.



# ‘Em ê hewil bidin ku werzê duyemîn yê xwendinê berdewam bikin ’

Mamosteya şopandina zimanê Kurdî ya bajarê Qamişlo Esmehan Seado diyar kir ku li dibistanên koçber ji wan derketine wê perwerdeya xwendekaran ya werzê duyemîn berdewam bikin.

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

Ev bû demek ku koçberên ji Tebiqa û Reqayê di dibistanên kantona Cizîrê bicih bûne. Ji ber wê li gelek bajaran dibistan hatin rawestandin û xwendekar dûrî mafê xwe yê xwendinê ketin. Lê piştî demekê li bajarên Amûdê, Hesekê û gundên derdora Qamişlo werzê duyemîn yê perwerdeyê hate destpêkirin. Niha jî li bajarê Qamişlo û Dêrikê mamoste hewil didin li hin dibisanên ku koçber ji wan derketine perwerdeya werzê duyemîn berdewam bikin.
Di derbarê mijarê de mamosteya şopandina zimanê Kurdî ya bajarê Qamişlo Esmehan Seado ji Rojnameya me re axivî.

**‘Li gelek bajaran perwerde berdewame’**



Esmehan di destpêka axaftina xwe de bal kişand li ser perwerdeya xwendekaran û wiha got: “Ev demeke ku koçber di dibistanên kantona Cizîrê de bicih bûne, ji ber vê yekê gelek xwendekar ji mafê xwe yê xwendinê dûr ketin. Lê belê heya niha bajarên weke Amûdê, Hesekê û gundên li derdora Qamişlo perwerdeya wan ya xwendinê berdewame. Lê tenê li bajarê Qamişlo û Dêrikê xwendekar ji ber derengmanîna koçberan di dibistanan de hîna dest bi perwerdeya xwe nekirine.

**‘Wê li hin dibistanên Qamişlo û Dêrikê perwerde dest pê bike’**

Esmehan da diyarkirin ku ew ê li hin dibistanên Qamişlo û Dêrikê dest bi perwerdeya xwendekaran bikin û wiha got: “Heya niha xwendekarên bajarên Qamişlo û Dêrikê dest bi werzê perwerdeyê yê duyemîn nekirine. Ji bo wê jî li dibistanên Qamişlo û Dêrikê em niha hewil didin ku xwendekaran kom bikin, da ku perwerdeya xwe ya werzê duyemîn berdewam bikin û dûrî xwendina xwe nekevin. Ji xwe li hin dibistanan wê dewam bibe du foc Yek sibehê û yek jî nîvro. Herwiha di rojevê de ye ku roja şemiyê jî bibe dewam da ku waneyên wan yên ku ev bû nêzî du mehan li wan çûne em ji wan re berdewam bikin. Dibe ku em dewamê dirêj bikin da ku xwendekar pirtûka xwe ya werzê duyemîn bidawî bikin û tu astengî di dema pêş de li xwendekaran neyên kirin.”

**‘Wêneyên ku li xwendekaran çûne em ê ji wan re vegerînin’**

Esmehan Seado da zanîn ku heya karibin ew ê wêneyên ku li xwendekaran çûne vegerînin û wiha bidawî kir: “Ev rewşa ku em tê re derbas dibin xwendekar jî dizanin, ji ber wê xwendekar bi mamosteyên xwe re rojane serdana dibistanên xwe dikin. Di heman demê de jî bi mamosteyên xwe re alîkariyê bi koçberan re dikin. Em jî li gorî derfetan heta ku em karbin em ê hewil bidin ku ev waneyên li xwendekaran çûne ji wan re vegerînin. Da ku xwendekarên me ji mafê xwe yê xwendinê dûr nekevin.”

# Li Îranê rewşa jiyanî her ku diçe xerab dibe

**Navenda Nûçeyan**

**Geşedanên leşkerî di nûçeyên medyayê yên li ser bûyerên li Îran û herêmê de serdest in. Her çend gelek dezgeh êrîşên hewayî, êrîşên bi mûşekan, hejmarên qurbaniyan û windahiyên madî girîng dibînin jî, rewşa li ser erdê şert û mercên jiyanê hewceyê baldariyê ye.**

Di 28’ê Sibata 2026”an de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Îsraîlê êrîşên leşkerî li dijî Îranê dest pê kirin. Îranê bi êrîşan li dijî Îsraîl, Sûriye, Urdun û welatên Kendavê, di nav de Behrêyn, Îmaratên Yekbûyî yên Erebî, Kuweyt û Qeter, bersiv da. Di saetên serê sibê yên 1’ê Adarê de, medyaya dewleta Îranê mirina Xameneyî piştrast kir, tevî înkarkirinên berê. Li Îran her ku diçe rewş dijwartir dibe.
Lê tiştê ku çavdêrî û şopandina van rewşan dijwartir dike ne tenê rewşa ewlehiyê ye, ji ber ku qutbûna înternetê ya hema bêje temam li deverên mezin ên welêt pirsgirêkek mezin e ku pir caran rê li ber vê yekê digire.

**Gişbûneke bêhempa**

Tevî pirsgirêkên siyasî û ewlehiyê yên ku Îran pê re rû bi rû ye, krîza aborî hîn jî faktora herî berbiçav di jiyana rojane ya welatiyên wê de ye. El Hura karî bi çavkaniyên ji hundirê welêt re têkilî dayne ku piştrast kirin ku tirs û fikara heyî ne tenê bi zêdebûna leşkerî ve girêdayî ye, lê di heman demê de bi lêçûna jiyanê ya her ku diçe xirabtir dibe jî ve girêdayî ye. Li gorî raporên Banka Navendî ya Îranê û Navenda Ihsaiyata Îranê, Rêjeya gişbûnê ya di Sibata 2026”an de gihîşt nêzîkî %68.1, asta herî bilind a ku di dehsalan de hatiye tomar kirin. Gişbûna bazirganiya mehane jî gihîşt %9.4, ku nîşan dide ku leza zêdebûna bihayan di demek kurt de xeternak e. Ev hejmar rewşek jiyanê ya pir dijwar nîşan didin, ku zêdebûna bihayan êdî gav bi gav çênabe lê bilez û pir caran ji nişka ve bûye.
Zêdebûnê bandor li piraniya kelûpelên bingehîn kir, nemaze kelûpelên xwarinê, ku barê herî mezin li ser malbatan pêk tînin. Bihayên xwarinê li gorî sala borî ji %110 zêdetir zêde bûne. Di heman demê de, buhayên nan û genim %142 zêde bûn. Bihayên goşt %117, şîr, penêr û berhemên hêkan %108, di heman demê de buhayên fêkiyan jî %113 zêde bûn. Rûnên nebatî yek ji zêdebûna herî zêde tomar kirin, gihîştin %207 û ew kirin nav kelûpelên ku herî zêde ji gişbûnê bandor bûne.
Ev gişbûna tûj bi awayekî eşkere hêza kirînê kêm kiriye, ji ber ku zêdebûna mûçeyan di salên 2025 û 2026”an de ji %45 derbas nebûye, ku ev di pratîkê de tê vê wateyê ku mûçeyên welatiyan beşek mezin ji nirxa xwe ya rastîn winda kirine. Di encamê de, gelek malbat neçar man ku xerckirina xwe kêm bikin, nemaze di warê xwarin û dermanan de û bi kêmtirîn pêdiviyên bingehîn têr bibin.

**Astengiyên dabînkirin û enerjiyê**

Ji bilî gişbûnê, êrîşên leşkerî yên dawî krîza aborî bi bandora li ser binesaziya petrol û lojîstîkê girantir kirine. Raportên medyaya Îranê destnîşan dikin ku zirar gihîştiye hin tesîsan, ku rasterast bandorê li operasyonên veguhastin û belavkirinê di nav welêt de dike. Vê yekê krîza dabînkirina petrolê hîn girantir kiriye. Li gelek bajaran qutbûna elektrîkê ya dubare çêbûye, digel rêzên dirêj li benzînxaneyan. Ji ber kêmbûna hilberînê û astengiyên di torên belavkirinê de, buhayê benzîn û gaza pijandinê jî zêde bûye, ku barekî din li ser welatiyan zêde kiriye.



Bazar, bi vî awayî, dest bi kêmbûna hin kelûpelên bingehîn kirine, wek rûnên nebatî, derman û hejmarek kelûpelên xwarinê, bi taybetî bi zêdebûna lêçûnên îstîradkirin re ji ber kêmbûna nirxa diravî û zêdebûna xetereyên têkildarî veguhastin û barkirinê. Her ku ev astengî berdewam dikin, fikarên li ser berfirehbûna cûdahiya di navbera dabînkirin û daxwazê de zêde dibin, ku dikare di mehên pêş de bihayan hîn bilindtir bike.

**Xizanî û bêkarî zêde dibin**

Li gorî raporên Îranê, di bin van şert û mercan de rêjeya bêkariyê di dawiya 2025”an û destpêka 2026”an de gihîştiye nêzîkî %7.8 ve. Her çend ev rêje li gorî hin welatên din kêm xuya bike jî, giraniya wê ji ber ku bi gişbûna bilind û kêmbûna hêza kirînê re hevdem e, ev tê vê wateyê ku beşek mezintir a nifûsê niha di xetereya xizaniyê de ye. Raport nîşan didin ku gişbûn di hin sektorên xwarinê de ji %100 derbas bûye, ev yek jî bûye sedem ku gelek malbat şêwazên xerckirina xwe bi awayekî berbiçav biguherînin, xwe bispêrin alternatîfên erzantir an jî hejmara xwarinên rojane kêm bikin. Dabînkirina derman jî bûye pirsgirêkek mezin, nemaze ji bo malbatên kêmdahat.

**Krîzek kûr û kombûyî**

Dikare were gotin ku krîza aborî ya li Îranê ne berhema zêdebûna leşkerî ya dawî ye, lê belê encama kombûna dirêj a dorpêçên navneteweyî, rêveberiya xirab a aborî û nehevsengiyên avahîsaziyê di aboriyê de ye. Lêbelê, lêçûnên leşkerî û aloziyên herêmî yên dawî bi têkbirina zincîrên dabînkirinê û zêdekirina lêçûnên hilberîn û hawirdekirinê beşdarî kûrkirina vê krîzê bûne.
Îro, welatiyên Îranî bi zextên giran re rû bi rû ne, gişbûna bazirganiyê, kêmbûna hin kelûpelan, astengiyên enerjiyê û kêmbûna dahata rastîn. Her çend pêşketinên leşkerî û siyasî berdewam bikin jî, bandorên aborî li ser jiyana rojane yên herî bi bandor dimînin û beşên mezin ên civakê li ber pirsgirêkên jiyanê yên bêhempa datînin.

**Bîra Civakê**

## Herikîna xwîna civakan lêçûna şeran zêde dikin



**Ehmed Hesen**

Di nava sîstema global a kapîtalîzmê de ya ku tê dîtin bi qasî ku talan û komkujî li Rojhilata Navîn firehtir dibin, ewqas jî deynê çekên ku di şeran de tên tecrûbekirin de zêde dibe, ev yek di şerên du sedsalên dawiyê de hatine meşandin bi eşkereyî hatin dîtin, îro jî bi gurkirina şerê di bin navê Bihara gelan de pêş ket û fireh bû ev rastî hate dubarekirin, ji civaka Efrîkayê bigire heta civaka Iraqê, ji civaka Okraynayê bigire heta civaka Yemenê, ji civaka Sudanê bigire heta ya Sûriye û Lubnanê em heman rastiyê dibînin, ew jî gurrkirina şerên etnîkî û mezhebî ye, bi qasî ku civak di nava şeran de dixeniqin, ewqas jî fînansa hêzên hegemonîk di nava nirx û karê zêde de melevaniya perezêdekirinê dikin. Di roja îro de rikberiya li ser belavkirin û zêdekirina çekên nûklerî di cîhana hêzên hegemondar de gelekî gihîştiye asta xeteriyê ku bikaranîna wan hemû cîhana me be erdê re bike yek. Di heman demê de çêkirina van çekan Ekolojîya cîhanê dixe metirsiyeke mezin. Di serî de Îsraîl ji bo ku dawî li tevgerên cîhadîst û Huzbillahê bîne bajar bi erdê re kirin yek, hewirdor talan kirin û bi hezaran kes kuştin, di heman demê de şerê li Okranyayê û Îranê kirîzên gaz, genim û petrolê li cîhanê gihandîye asta herî bilind. Ev yek di serî de dikeve xizmeta sîstema kapîtalîst a ku Îngilistan û Emerîka pêşengtiya wê dikin. Di nava vê kirîzê de jî civak tên qirkirin, bajar bi erdê re dibin yek û xeteriya dawîanina li jiyanê zêde dibe, ev hêzên bi çekan dagirtî li ser hesabên qirkirina gelan lêçûna çêkirina çekên xwe sax dikin, welatan difiroşin û sînorên hiqûqan li gorî xwe organîze dikin. Lewra jî gotina ku dibêje “di şeran de exlaq li aliyekî dimîne” pênaseya herî rast a rastiya roja îro ye. Yên ku rê dan Sedam Huseyin ku li dijî kurdan çekên kîmyewî bi kar bîne, heman ferasetê îro êrîşî Rojava kir, zarok qetil kirin û malên kurdan talan kirin. Lewra jî çendîn sîstem bên guhertin, ger feraseta qirker a li dijî civakan holokostan pêk tîne dubare bibe, hingê em nikarin behsa guhertinê bikin. Bi qasî ku li ser rûyê erdê hêza civakî ji hev du bikeve, ewqas pergala serdest girêkên kirîz û pirsgirêkan di nava civakê de firehtir dike. Di dîroka kirîza Sûriye de yê ku herî zêde bûye qurbanê hesabên navdewletî taybet Rusya, Emerîka û rêxistinên Terorîst ên DAÎŞ û Nûsrayê gelê Sûriye û pêkhateyên wê bûn, di bin navê şoreş û bihara ereban de destwerdanên herî mezin li ser xaka Sûriye hatin kirin û gel di qirkirinê re derbas bû, hem ji aliyê hêzên muxalif ve û ji aliyê rêjîma Esed a ketî de gel kirîz û şerên herî dijwar jiyan kir, a rast şoreşa ku gel pê rabibû ket bin berjewendiyên hêzên serdest û hegemondar. Di heman demê de di bin navê şerê terorê de rêjîmê û di heman demê de komên çete yên dewleta Tirk terorîzekirina herî mezin di derheqê gelê Sûriye de kirin. Ev hevkêşe wê yekê diyar dike ku di bin navên rewa de tunekirina civakan tê sepandin. Li vir a ku tê xwestin xurtkirina hêza civakî û redkirina zîhniyeta sîstemên qirker bi rêbazên siyasî, çandî û têkoşîna civakî ye. Hem zanebûna civakî ya îdeolojîk, hem jî yekgirtina wê ya hevpar dikare rê li ber qirkirina çandî û fîzîkî bigire û armanca qirkirinê têk bibin.